

## HIKÛMETA KURDISTANÊ

Li derveyî welêt bi pêşengiya rêxistin, partî, sazî û nûnerên gel ên kurd û Kurdistanî qerareke dîrokî

● Hikûmeta Kurdistanê ya Sirgunê di 12'ê rêbendanê de li paytexta Belçîkayê li Brukselê, li Navenda Çapemeniyê hate îlankirin.

● Yaşar Kaya, "Li Rojhilata Navîn 40 milyon kurd ji statuya hiqûqî bêpar in û mucadeleya wan a ji bo bidestxistina mafên xwe, bi qelî-aman hatiye fetisandin."

● Georges Ario, "Dewleta tirk derewan dike û dibêje kurd li asûriyan tadeyan dikin. Neheqiyên dewletê berî PKK'ê jî hebûn, lê piştî 1984'an bêhtir bûn. Gerîla, her tim jî me re bûn alîkar û em parastin."

● Ali Sapan, "Di Komîteya ji bo Haziriya Parlamentoyê de partiya me PKK, di nava vê hereketê de ye. Ji bo qerarên parlamentoyê bên standin û bimeşin, partiya me amade ye."

● Remzi Kartal, "Em menfeeta gelê kurd li pêşiya her tişî dibînin. Me tu carî PKK jî gelê Kurdistanê veneqetand. PKK, ji zû ve şerê azadiyê dide û cihê me jî li cem Tevgera Azadiyê ye."

Rûpel 2-3



Bi salan e ku, nûnerên bi milyonan kurdên ji ber dîtinên xwe ji Kurdistanê hatine dûrxistin li derveyî welêt doza kurd û Kurdistanê bi awayên cur bi cur didomînin.



Ali Sapan û Remzi Kartal di dema civîna çapemeniyê de.



### Xewna şewitî

Ez bi ku ve diherim, derî girtine, min pêncî sal derbas kirine. Karên giran nema ji min tên, ka xortaniya min a berê?! Wey mala kalbûnê xera bibê, ez bûme sofiyê mala şêx.

Rûpel 7

### Vejin bêziman nabe

Ev rewş jî, ji bo kurdan qonaxeke nû ye. Ziman saziyeke civakî ya bican e. Wekî mirovan ew jî dijî. Bi wan re dijî. Ew di nava mirovan de ye, mirov di nava wê de ne. Ji bo vê yekê, jiyana ziman û mudaxeleya ku lê çêdibe.

Rûpel 11

### Hêviya çiman

Ma mêrdimey ra hêviya xwi bibirnî? Mêrdimey ra hêvî biriyêna? Çirê zilm endi serdestey keno? Mêrdimeya ki şêna hukim bika vay û varanî, ard û asmênî û heme qul û ganî çirê bena yesîrê zilmî?

Rûpel 12

CIWAN HACO:

'GEREK E STRANÊN EVÎNÎ JÎ PÊŞVERÛ BIN'

Rûpel 8-9



Li derveyî welêt bi pêşengiya rêxistin, partî, sazî û nûnerên gel ên kurd û Kurdistanî qerareke dîrokî

JI ROJEVÊ

## SAZIYA TEMSÛLKIRINÊ


Ji bo avakirina Parlementoya Surgûnê ya Kurdistanê, li Brukselê start hate dayin. Di rojên pêşde tesîra wê hem li nav kurdan û hem jî li dinyayê bêtir bê fêmkirin. Îro jî bo kurdan, saziya temsîlkirinê ya herî bilind, bêşik, ev parlemento ye. Lazim e îmkân, di wextê de û bi awayekî cidî bê bikaranîn.

**Kurd, çawa û çima hatin vê merheleyê: Li Ewrûpayê 87 hezar kurdî, di 20-22'ê sermaweza 92'an de deng dan 153 delegeyan. Van delegeyan, di 19-20'ê berfanbara 92'an de 15 mebûs jî bo Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê, hilbijart. DEP û mebûsên wê, di 2'ê adara 1994'an hate girtin. Ji van 7 heban ceza xwarin, 6 heb mebûs jî derketin Ewrûpayê. Yanî li Tirkîyeyê îmkana siyaseta kurdan nema. Li Sovyeta berê di nava 94'an de 80 delegeyên ku li ser navê milyonekîzêdetir kurd dipeyivîn, PKK wek nûner îlan dikirin. Encama bûyerên wisa, Parlementoya Surgûnê kir îhtiyac. Meseleya herî muhîm, meşandina vê saziyê ye.**

# HIKÛMETA KURDISTANÊ YA SURGÛNÊ



Serokê Rûmetî yê DEP'ê Yaşar Kaya di karên sazîkirinê de ye.



Remzi Kartal wek nûnerê DEP'ê di nav karê sazîkirinê de xuya dike.



Nûnerê Hereketa Îslamî Abdurrahman Durre

Hikûmeta Kurdistanê ya Surgûnê di 12'ê Rêbendanê de li paytexta Belçîkayê li Brukselê, li Navenda Çapemeniyê hate îlankirin. Mebûsê DEP'ê Remzi Kartal, civîna çapemeniyê vekir û li ser navê parlamentoyê Serokê Rûmetî yê DEP'ê Yaşar Kaya, bi beşdariya 23 nûnerên siyasî, daxuyaniya ku bi kurdî hatibû hazîrkirin, xwend.

Yaşar Kaya, di axaftina xwe de got ku li Rojhilata Navîn 40 milyon kurd jî statuya hiqûqî bêpar in û mucadeleya wan a jî bo bîdestxistina mafên xwe, bi qetlîaman hatiye sekinandin.

### Parlementoyeke pirdeng

Li gorî metnê ku Yaşar Kaya xwend, wê di parlamentoyê de pirdengiyê hebe û heta jî dest bê ew nakeve bin tesîra rêxistînekê. Ji kurdên metropolên Tirkîyeyê, jî Ewrûpayê, jî Sovyeta berê û jî Kurdistanîyên ku li welatên din dijîn, wê karibin xwe di vê parlamentoyê de temsîl bikin.

### Hilbijartina mebûsan

Di civîna çapemeniyê de li ser hilbijartina mebûsan jî hate sekinîn. Ji bo vê yekê li ser navê her çîn (sinif) û tebeqeyên gel, her sazî û yekîti wê nûnerên xwe, bi sîstema hilbijartinê di du caran de hilbijêre. Li gorî vê, wê kontajan jî saziyan re bê veqetandin. Hilbijartin jî wê ne li ser sindoqan çêbibe, lê belê wê sazî di nav xwe de nûneran hilbijêre.

Parlementoya Surgûnê piştî demekê wê bi parlamentoyên eyaletan re bibe yek û jî bo Kongreya Neteweyî wê bibe pêlîkek.

### PKK jî tê de ye

Di civîna çapemeniyê de berpirsiyarên ERNK'ê yê Ewrûpayê Ali Sapan jî li ser pîrsa, "PKK jî wê di par-

mentoyê de cih bigire?" ev bersiv da, "Di Komîteya ji bo Hazîriya Parlamentoyê de û di amadekirina civîna çapemeniyê de Partiya me PKK, bi xwe di nava vê herketê de ye. Ji bo qerarên wê bîstandin û bîmeşin, partiya me amade ye."

### Metnê çapemeniyê gihîşt Butros Galî

Nûnerên Parlementoya Kurdistanê ya Surgûnê, metnê ku di civîna çapemeniyê de hate xwendin û tê de armancên parlamentoyê hebûn, gihandin serokê Neteweyên Yekbûyî Butros Galî.

Di civîna de 23 nûnerên siyasî hebûn. Di nav wan de; Serokê Rûmetî yê DEP'ê Yaşar Kaya, berpirsiyarê ERNK'ê yê Ewrûpa Ali Sapan, cîgirê serokê DEP'ê Remzi Kartal, Serokê Hereketa Îslamî ya Kurdistanê Abdurrahman Durre, Serokê Federasyona Asûriyên Ewrûpa Georges Ario, Serokê Alewiyan Kurdistanê Ali Haydar Celasun, Serokê Enstîtuya Kurdî Prof. Dr. Îsmet Şerif Wanlî û Serokê Beledîya Geverê (Yüksekova) yê berê Necdî Buldan cih digirt.

Li gorî agahiyan wê parlemento, heta meha adara pêş hazîriyên damezrandinê biqedîne.

**Rojnameya me, metnê ku bi kurdî hatibû hazîrkirin û Yaşar Kaya di civîna çapemeniyê de xwend, bi temamî diweşîne:**

"Ez bi navê gelê xwe, bi navê Komîteya Amadekirina Parlementoya Kurdistanê ya Surgûnê, li we hemûyan silavan dikim.

Sedsala me jî bo neteweyan sedsala azadî û demokrasîyê, sedsala mafê mirovatîyê ye. Di dawîya vê sedalê de, li Rojhilata Navîn nêzîkî 40 milyon Kurdistanî, jî statuyên qanûnî mehrûm in.

Di dema damezrandina cumhuriyetê de dewleta

tirk bi her awayî jî kurdan alîkarî stand. Piştî ku ev dewlet hate îqtidarê jî, li dijî gelê kurd siyaseteke înkarkirin û îmhakirinê birêvebir.

Ji bo mafê meşrû, hemû têkoşînên kurdan bi qetlîaman hatine fetisandin û mirovên kurd hatine sirgunkirin.

Îro li ser axa Kurdistanê ya îşxalkirî têkoşîneke neteweyî bi firehî tîye dayîn. Di dîrokê de cara yekemîn e ku dewleta tirk li hemberî têkoşîna azadiya kurdan bêçare maye.

Ji aliyê kurdan ve pêşniyarên çareserkirina siyasî, şerrawestandinê tên kirin. Dewleta tirk van pêşniyaran red dike. Ew di siyaseta eskerî ya zorê îsrar dike.

Gelê me îro jî hemû zagonên navneteweyî bêpar û mehrûm dijî. Dewleta tirk jî hemû peymanên navneteweyî ku pejiwandine, bînpê dike. Pirsgirîka Kurdistanê, pirsgirîka nava Tirkîyeyê nîn e, pirsgirîkeke navneteweyî ye.

Dewlet di warê zorê de tu sînorî nas nake. Gundên me tîne xerabkirin û şewitandin, welatê me tîne bêmirovkirin. Ji her tebeqe û pişeyî insanên me jî aliyê dewletê ve tên kuştin. Dewletê hemû kes û saziyên ku jî xwe re wek muxalîf dibîne partiyên siyasî, parlamenter, rêxistinên mafê mirovan, zagonzan, rojnamevan, rewşenbîr, xort, gundî, karker, kal hemû insanên medixwaze an bi îmhakirinê an cezakirinê an jî sirgûn bîdeng bihêle.

Her çar dewletên ku Kurdistan parvekirine otorîte û parlamentoyên wan vîna gelê kurd tu caran temsîl nekirine. Meclîsa Neteweyî ya Tirkîyeyê jî, meclîsa pejiwandina qetlîma li Kurdistanê ye, jî aliyê genaralan ve tîne birêvebirin, meclîsa tirkîkirinê ye, ev kar hîn jî dom dike.

Ji ber vê yekê, parlamenterên ku bi îradeya gelê me





...KURTENÛÇE...

**PDK û YNK li hev tîn?**

Şerê ku di navbera PDK'ê û YNK'ê de dewam dikir, sekinî. Li gorî agahiyan, ji 5'ê rêbandanê û bi vir de şer çênabe û herdu alî jî ji bo lihevhatinekê haziriyên dikin. Li başûrê Kurdistanê di 24'ê berfanbarê de şer derketibû û nêzî 500 kesî miribû.

**YCK'ê Kongreya PKK'ê pîroz kir**

Yekîtiya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê (YCK) li ser bûyîna Kongreya 5'an a PKK'ê, şahiyek çêkir. Şahî di 8'ê vê mehê de li bajarê Almaniyayê Marpdorfê çêbû û 600 kes beşdar bûn. Di şahiyê de berpirsiyarê ERNK'ê yê vê herêmê axaftinek kir.

**Kontra ji kuştinê têr nabe**

Li taxa 19 Mayîsê ya Edeneyê kontrayan êrîş bir ser qehweyekê. Di vê êrîşê ku roja 12'ê rêbandanê de çêbû, kesekî bi navê Hacı Bahadın Oğuz mir, 8 kes jî birîndar bûn. Di nava kesên birîndar de, birîna 3 kesan xedar e.

**Tirkiye nikare KİT'a xwe bifroşe**

Çiller, nikare KİT'ê (Saziyên Aborî yên Dewletê) bifroşe. Li gorî hesabê Çiller yê 95'an, wê bi 5 milyar dolarî (Sektora şexsî ya tirkî 3.6 û sermaya biyan 1.4 milyar) saziyên dewletê bifrota sektora şexsî. Lê sektora şexsî ya tirkî naxwaze ku van saziyan bikire.

**Qanûna Bingeîn tê guherandin, lê?**

Ji bo guherandina Qanûna Bingeîn, haziriyên meclîsa Tirkiyeyê dewam dikin. Partiya Refahê, bi partiyên ku grûbên wan di meclîsê de hene, li ser benda 24'an ya li ser baweriyên dîni li hev nakin. Ji aliyê din kes li ser bendên ku rê li ber fikrê digrin, nasekine.

**'Li Tirkiyeyê rojnamevantî zor e'**

Li gorî berpirsiyarê Rêxistina E-fûyê li Tirkiyeyê jiyana rojnamevanan di tehlîkeyê de ye. Berpirsiyarê Tirkiyeyê yê ji beşa Îngilistanê Paul Mansour, li ser bomberkirina Özgür Ülkeyê ev got: "Elegeya van êrîşan, bi şerê Kurdistanê re heye".

**MGK'ê qerar stand: 'Bila Özgür Ülke belav nebe!'**



Rojnameya Özgür Ülkeyê, piştî serê salê û bi vir ve tê berhevkerin. Rojname, li dû civîna serê salê ya Konseya Ewlekariya Millî (MGK), ji 6'ê rêbandanê (hejmar 254) û pê ve, ji aliyê serdozgerên Mehkemeya Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê (IDGM) ve li ser hev, tê berhevkerin. Serdozgerê mehkemeyê, biryara berhevkerinê piştî çapa rojnameyê dide û polis di matbaayê de an jî li şirketa belavkerinê dest datîne ser Özgür Ülkeyê.

Li ser vê tewra mehkemeyê berpirsiyarên rojnameyê diyar kirin ku dewletê bi girtinê, kuştinê û bombekirinê nikaribû rê li ber weşana Ülkeyê bigirta. Îcar dixwazin bi vê riyê weşana rojnameyê bisekinînin. Berpirsiyarê Giştî yê We-

şanê Bakî Karadeniz, daxuyanîyek da çapemeniyê û ev tewra dewletê protesto kir. Karadeniz di daxuyanîya xwe de got ku dewlet bi vê riyê dixwaze rê li ber azadiya ragihandin û xebirdanê bigire.

Ji aliyê din ve, berpirsiyarên rojnameyê îdîa dikin ku biryarên mehkemeyê yên berhevkerinê, ji bo hemû hejmaran eynî metn e. Li gorî berpirsiyarên Özgür Ülkeyê, biryarên mehkemeyên li ser direktîfên MGK'yê dest pê kirin û ji bo vê yekê jî neqanûnî ne. Özgür Ülke, nivîsên ku dibin sebebên berhevkerinê ji hejmarê derdixînin û rojek bi derengî digihîjin xwendevanan. Yanî rojê du rojname derdikevin.

Navenda Nûçeyan

hatine hilibjartin îro an di gorê de ne, an di zindanê de an jî li Surgûnê ne.

Koçberiya mecbûrî, Surgûnê kiriye qedera me ya dîrokî. Ji bilî vê yekê, niha 12 milyon kurd li derveyî welatê xwe dijîn. Gelê me yê li surgûnê, mafê bilêvkirina daxwazên xwe, wê bi parlamentoyê binê cih.

Li aliyê din, li welatê me bi xwîna bi hezaran şehîdên me têkoşîna neteweyî tê dayîn. Bi vê têkoşînê li ser herêmên rizgarkirî, parlamentoyên eyaletan tîn avakirin. Parlemantoya neteweyî di pêşerojê de wê bi parlamentoyên eyalatan re bibe yek û bibe parlamentoyêke neteweyî. Ev mafê gelê me yê jênager e.

Parlementoya Kurdistanê ya sirgunê: Behaneke veqetandinê nîn e. Li aliyê wekhevîyê gelê kurd û tirk yekîtiya wan a demokratîkî ye. Parlemantoya me piraniyê esas digire, ji her kes, sazî û rêxistinên siyasî yên ku piştigiriya tevgera rizgariya neteweyî dikin re, vekiriyê.

Parlementoya Kurdistanê ya sirgunê:

Li ser axa me tu cudahiyeên millî, olî, mezhebtî û cinsî naxê navbera gelên Kurdistanê. Daxwazên wan bi cih tîne. Wê bibe temînata gelên li ser axa Mezopotamyayê ku dergûşa medeniyetê ye.

Parlementoya Kurdistanê ya sirgunê: Li welatê me hemû îşxalên neteweyî red dîke. Li dijî vê îşxalê tevgera rizgariya neteweyî ya Kurdistanê meşrû dibîne, piştigiriya wê dîke û bi pêşve dibe, geş dîke.

Parlementoya Kurdistanê ya sirgunê: Hêza xwe ji Kurdistanê û ji tevgera rizgariya neteweyî digire. Li derve hebûna gelê me diparêze, geş dîke, ji bo vê jî biryarên pêwîst digire.

Parlementoya Kurdistanê ya sirgunê: Li gorî encama referandûma û îrada gelê me hereket dîke.

Parlementoya Kurdistanê ya sirgunê: Tevgera rizgariya neteweyî bi dinyayê dide naskirin. Bi hikûmet û saziyên navneteweyî re têkiliyan çêdîke. Hemû têkiliyên siyasî û diplomasiyê organîze dîke.

Parlementoya Kurdistanê ya sirgunê:

Bi çalakiyên siyasî, aborî, civakî û perwerdeyî yên Kurdistanîyên li derveyî welat dadîkeve. Qanûna hemwelatîyê derdixê û bi pêşve dibe.

Parlementoya Kurdistanê ya sirgunê: Endamên xwe ji nûnerên gel ên li sirgunê, serokên belediyan ên li sirgunê, kesên ku berê jî bo Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê (MNK) ku heya niha ji tevgera rizgariya neteweya Kurdistanê re xizmetê dikin, ji rewşên biran û birêvebirên DEP'ê yên li sirgunê hildibijêre.

Parlementoya Kurdistanê ya sirgunê: Endamên xwe ji saziyên neteweyî yên li derveyî welat di Konferansên gel de hildibijêre.

Parlementoya Kurdistanê ya sirgunê: Hemû amadekariyên xwe ji aliyê Komîteya Amedekar ve ku ji 23 kesan pêk tê, heya dema damezrandinê, Adar 1995 ku ji xwe re dîke armanc, bi rê ve dibe. Komisyon, ger li welat, ger jî li sirgunê, nûnerên xwe ji kesên ku ji aliyê gel ve hatine hilibjartin, hildibijêre."

KURD-A / WELATÊ ME



YAŞAR KEMAL DI KOVARA DER SPIEGEL'Ê DE NIVÎSAND:

# Behr ziwabû, masî nehat girtin!

**K**ovara navdar a almanî ku heftiyê carekê derdikeve, di hejmaraya xwe ya dawî de cih daye nivîseke taybet a Yaşar Kemal. Roman-nivîsê kurd ê binavû-deng Yaşar Kemal di vê nivîsa xwe ya ji çar rûpelan pêk hatiye de, li ser pirsgrêka kurdan û weşeta dewleta tirk sekiniye. Nivîskarê navdar bi vê maqaleyê bala hemû raya gel a dinyayê dikişîne ser pêkanîna dijwar ên ku ev 70 sal in dewleta tirk li hemberî gelê kurd dimeşîne. Yaşar Kemal dinivîse ku Tirkiye bi mucadeleya ku li dijî PKK'ê dimeşîne, xwe hem ji hêla siyasî, hem jî ekonomîk ve xistiye nava rewşeke welê xerab ku êdî li ber hilweşînê ye. Nivîskarê kurd Yaşar Ke-

mal bi vê nivîsê tîne ziman ku ji roja ku Komara Tirk ava bûye heta îro dewletê her cure neheqî li kurdan kiriye, zimanê wan qedexe kiriye, mebûsên wan ji meclîsê avêtine û xistine hepsê, du hezar gundên wan şewitandine, bi hezaran rewşenbîr, karker, gundî û xwendevanên wan bi destê kontrgerîla kuştine, bi milyonan gundiyan wan sirgûn kirine, yê dengê xwe derxistine, dengê wan bi darê zorê hatiye birîn û hwd. Yaşar Kemal piştî rêzkirina neheqî û zilma dewletê, behsa berxwedana gelê kurd a ku bi PKK'ê dest pê kiriye, dike. Nivîskar şerê ku dewlet li hemberî PKK'ê û gelê kurd dimeşîne, wek hovîti û weşetekê bi nav dike.

Ji tewr û hereketên hêzên dewletê mînakên weşetê tîne ziman û dibêje: "Mesela hêzên dewletê ji bo ku gerilayekî/ê bikujin, daristanekê bi temamî dişewitînin. Kemal hemû hereketên dewletê bi gotineke balkêş wiha ifade dike: "Komara Tirk dixwaze behrê ziwa bike, ji bo ku masiyan bigire. Dawî dewletê behr ziwa kir lê nekarî mesî bigire." Çapemeniya tirk reaksiyonên balkêş nîşanî vê nivîsa Yaşar Kemal dan. Ji xeynî nivîskarên faşîst û nijadperest ên mîna Emîn Çölaşan û Bedri Baykam, nivîskarên ku wek demokrat dihatin zanîn jî rexne li Yaşar Kemal girtin. Li aliyê din roman-nivîsê navdar Orhan Pamuk destek da Yaşar Kemal û diyar

kir ku ne mumkun e mirov dengê xwe li hemberî weşetên ku li Tirkiyeyê pêk tînin, dernexe. Ji nivîskarên Hürriyetê Yavuz Gökmen jî bi van gotinan helwesta xwe ji bo nivîsa Yaşar Kemal diyar kir: "Yaşar Kemal jî yek ji Voltaire'ên Tirkiyeyê ye. Niha, em li wî guhdarî bikin an wî jî bişewitînin?"



Yaşar Kemal

Serwîsa Wergerê



**Navên  
10 kesên  
xelatgirtî**

Münir Kaya  
Bursa

Hüseyin Gündüz  
Antalya

N. Kartal  
Fatih/Istanbul

Murat Taşkesen  
Adana

Cihan Karakaya  
Istanbul

Suzan Bilkaya  
Antalya

I. Oktay  
Ankara

Alişan Avel  
Kızıltepe/Mardin

Mehmet Yılmaz  
Batman

Sılava İris  
Urfa

Xaçepirs bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tîne belavkirin. Xelata vê heftiyê pirtûka **Abdurrahman Durre "Evîna Welat"** e. Peyva veşarî ya xaçepirsa hejmaraya 7'an: **Berfanbar Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nixandîna, divê hûn "Peyva Veşarî" di nav qutiyên li bin xaçepirsê binivîsînin û ji me re bişînin.

## Xelata Xaçepirsê



"Evîna Welat"  
Abdurrahman Durre

## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me divê

- |                                 |  |  |
|---------------------------------|--|--|
| <input type="checkbox"/> 3 Meh  | <input type="checkbox"/> Li Hundir<br>400.000 TL | <input type="checkbox"/> Li Derve<br>30 DM |
| <input type="checkbox"/> 6 Meh  | <input type="checkbox"/> 800.000 TL              | <input type="checkbox"/> 60 DM             |
| <input type="checkbox"/> 12 Meh | <input type="checkbox"/> 1.600.000 TL            | <input type="checkbox"/> 120 DM            |

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.  
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi  
Hesap No: 1100264-1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.  
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi  
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV Û PAŞNAV :  
NAVNIŞAN :

Navnişana Welatê Me

Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.  
Tel-Fax: 2491344 – 245 29 91

## X A Ç E P I R S A B I X E L A T

Kesê di wênayê de Ziman tédan	Di notayê de sekîn Şepe	Birader Ben, benik	Sembola Hidrojenê Hedef	Berf û ba Dê, da	Dar û ber
		1	7	Li dor gerîn	
Kar namus		Alîkarî		Hece	
	4	Kaxezê pêçayî			
		Hêlîn		3	
Ocaxa kilsê		Sembola Neonê			
Ar		Paytexta Yewnanîstanê	9		
	Bi erebî "Na"	2	Ne ku		Notayek
		Serbist			
		Sembola zîv		Bajareke Brezilyayê	Rih
		Nijadek		Pereyê Alman	
		Îşkence	8		5
		Navek			Agir
			6		Tîpa yekemîn
		Cejn		Sembola Oksijênê	Plaqa Tirkiyeyê



PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8 9



Piştî yazdeh salên ku bi şerê germ derbas bû;

# Li Srî Lankayê şerrawestandin

Serokkomara Srî Lankayê û Serokgerîlayên Tamil Elamê roja 3'yê rêbendanê li bajarê Jaffnayê biryara şerrawestandinê ji bo du hefteyan mor kir. Roja 7'ê mehê vê şerrawestane dest pê kir.

Serokkomara Srî Lankayê Chandrika Bandarannaike Kamaratungayê û Serokê Pilingên Rizgariya Tamil Elamê Velupillai Prabhakaran, bi veyrî biryara xwe şerê di navbera hêzên dewletê û gerîlayên Tamil Elamê de dan sekinandin. Wî şerê ku di sala 1983'yan de dest pê kiribû, bû sedemê mirina 30 hezar mirovî.

Gelê Tamilê ku welatê wan di navbera Hindîstan û Srî Lankayê de hatiye parve kirin, li hemberî hêzên dewletê şerê serxwebûnê dide. Parçeyek ji welatê wan wek rojhilata û bakurê rojhilata Srî Lankayê tê bi nav kirin. Wan li dora Jaffnayê ku li bakurê rojhilata Srî Lankayê dikeve herêmek rizgar kiriye.



**Kuştina berendamê serokkomariyê yê Partiya Neteweya Yekbûyî Camini Dissanayake pêvajoya aştiyê xist tengasiyê.**

Piştî tîkçûna şerrawestîne ya ku di navbera avrêla (meha 4'an) 1989'an û pûşpera (meha 6'an) 1990'î de pêk hatibû, hikûmeta tundra a Partiya Neteweya Yekbûyî şerêkî xwînrejî li hemberî gelê Tamil Elamê dimeşand. Vê Hikûmetê ji bo ku dawî li tevgera azadix-

waz bîne, dor li herêma rizgarkirî pêçabû. Hezên dewletê nehiştin ku mirovên sivil biçin û bîn vê herêmê. Ambargoya danibû ser wê herêmê û dixwest bi riya birçihîştinê wan teslim bigire. Li gorî peymanê şerrawestandinê wê ji bo îmarkirina vê herêmê 4 milyar rupee

(816 milyon dolar) bê veqetandin.

Polîtîkaya şer, bi hîlbijartina ku di kewçêra (meha 4'an) 1994'an de çêbû guherî. Di vê hîlbijartinê de Chandrika Bandarannaike Kamaratungayê propaganda ya aştiyê kir. Partiya wê Hekariya Gel zora Partiya Neteweya Yek-

bûyî birû hate ser kar. Pişt re wê gavên aştiyê waz avêtin, tevgera gerîlayan ji bi erênî bersiv da wê. Bi awayî riya aştiyê vebû.

Ev şerrawestandina duhefteyî tê hêvîkirin ku dirêj bibe. Nûnerên her du aliyên li ser çekdanîne ji dixebitin.

**SAMÎ BERBANG**

DIK

## Çeçenîstan û Tirkîye

Rûsya demeke dirêj e, dixwaze welatên ku berê bi Yekîtiya Sovyetê ve girêdayî bûn, ji nû ve bixe bin bandora xwe. Ji bo vê yekê jî metodên wek; şerê hundirîn derxistin, derbe li dar xistin, êrîşkirin û dagîrkirinê bi kar tîne. Dubendiya di navbera Rûsya û Tirkîyeyê, bi şerê Çeçenîstan û Rusyayê kete qonaxeke nû. Dema Boris Yeltsin roja 11'ê berfanbarê ferman da artêşa rûs ku têkeve nava Çeçenîstanê, Serokê vî welatî biçûk, Dzhokhar Dudayev dişiband Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan. Problema Tirkîyeyê jî li vir dest pê dikir. Heke Tirkîye li gorî polîtîkayên ku li Kafkasyayê dimeşand, bilivîya, diviyabû piştigiriyê bide çeçenîstan, lê Tirkîye heke li hemberî Rûsya derkeve û vê gelşê bîne platformên navneteweyî, bi xwe, xwe dike tengasiyê. Vê çaxê ihtîmal heye hin kesên din jî doza kurdan bînin rojevê. Wê çaxê nikare şerê bi PKK'ê re wek şerekî hundirîn, li hemberî terorîzmê bi nav bike. Wek encam derdikeve holê ku, welatêkî dagirker nikare, piştigirîya gelê bindest bike, ne li Bosnayê, ne li Çeçenîstanê...

Li Kurdistanê şerê azadiyê her diçe bilind dibe. Nekar hez dikin, dixwazin dengê azadiyê neçe cihanê. Ji bo vê yekê rojnameyan bombedikin, partiyên legal û demokrat digirin û mebûsên wan ji parlamentoyê davêjin. Derd û kula wan ew e ku dest û lingên şerê azadiyê bibirin û nehêlin ku dengê wê bigihîje dinyayê. Di dawîya vê sedsalê de gelên bindest nemane. Kurd, xwediyê gelek sazî û muesseseyan in, lê belê mirov dikare bibêje taca serê van muesseseyan tune ku karibe li ser navê gelê kurd siyaset û dîplomasiyê bimeşîne, li heq û hiqûqa gelê kurd xweyî derkeve û ji bo şer û aştiyê qeraran bide. Îro ji bo kurdan û bo Kurdistanê parlamentoyek, elzem e û ji bo me lazim e. Lê ew parlamento ji welatê xwe dûr e. Di lîteratura dinyayê de ji parlamentoyên wiha re dibêjin 'Parlamentoyên Surgûnê'. Di şerê cihanê yê duyemîn de Polonya yê, di 1960'î de Cezayirê, di demên dawî de Filistin û Afrîka Başûr li surgûnê parlamentoyên xwe ava kiribûn. Gelên Kurdistanê, ji bo ku li dinyayê xwe di saziyêke bilind de temsîl bikin, zagonên hemwelatiya Kurdistanê xurt bikin, pêwîst e xwe di nava şer û aştiya di bibînin. Ev kar tenê di parlamentoya ku karibe gelê



## REWŞA DINYAYÊ

YAŞAR KAYA

### Parlamentoya Kurdistanê ya Surgûnê

Kurdistanê temsîl bike de, wê pêk werin. Parlamentoya Kurdistanê ya surgûnê: Hemû rengên dagirkeriya li ser Kurdistanê napejirîne û piştigirîya tevgera rizgariya netewî ya gelê me dike, rewa (meşrû) dibîne û xurt dike. Hêza xwe ji Kurdistanê û ji tevgera rizgariya neteweyî distîne. Li derve hebûna gelê me diparêze, pêşve dibe û ji bo wê biryarên pêwîst digire. Li gorî encama referandûma ku derdikeve holê, îrada neteweyî qebûl dike. Tevgera rizgariya neteweya Kurdistanê bi dinyayê dide naskirin. Bi hikûmet û saziyên navneteweyî re pêwendîyan çêdike û pêşve dibe. Hemû tîkiliyên dîplomasiyê û politikî bi rê ve dibe. Di çarçovekê zagonî û meşrû de, di dinyayê de dibe nûnerê tevgera rizgariya neteweyî ya Kurdistanê. Ev nûnerê hebûna

Parlamentoya Surgûnê ya herî bilind e. Weke saziya herî bilind, îradeya gelên Kurdistanê yê li welat û derveyî welat dike yek û bi biryarên ku dîtine, bi riya komîsyonên û bi organên birêvebir (îcrayê) yê hîlbijartî pêk tîne û çavdêriyê dike. Ew li ser çalakiyên siyasî, aborî, civakî û perwerdeyî, yê Kurdistanîyên li surgûnê disekine û pê re mijûl dibe. Zagona hemwelatiya Kurdistanê pêşve dibe û li ser vê bingehe gelê me temsîl dike. Zimanê parlamentoya Kurdistanê ya surgûnê bi Kurdî ye. Parlamentoya Kurdistanê ya surgûnê: Gava yekemîn e ji bo kongreya netewî. Ji hemû neteweyan re, ku li Kurdistanê xwediyên hêzên temsîlkirinê ne, vekirîye. Wan dicivîne û di berewendiya neteweyî de digihîne

hev, vê ji xwe re wek wezîfe û delametê dibîne. Ew tu cudahiye millî, olî, mezhebî û cinsî naxe navbera gelên Kurdistanê. Ji bo hemû kes û saziyên ku Kurdistanê azad dixwazin û piştigirîya tevgera rizgariya neteweyî dikin, vekirîye. Parlamentoya Kurdistanê ya surgûnê: Hem li welat û hem jî li derveyî welat îradeya gel ya hîlbijartî tîne ziman. Di vê çarçoveyê de: Endamên xwe ji nûnerên gel ên ku li surgûnê ne, serokên belediyan ên ku li surgûnê ne, kesên ku berê ji bo Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê (MNK) hatibûne hîlbijartin û heya niha ji tevgera rizgariya neteweya Kurdistanê re xizmetê dikin û birêvebirên DEP'ê ji bo Parlamentoyê Surgûnê weke gava yekemîn parlamententer hildibijêre. Ji bo ku li welatê me mercên hîlbijartinê nûnerên gel bi azadî peyda nabin bi riya saziyên neteweyî û gelê me yê li surgûnê tîne hîlbijartin. Li ser bingeha van rastiyên jorîn, xebata parlamentoya Kurdistanê ya surgûnê ji aliyê komîsyona amadekirinê ve tê birêvebirin. Ev komîsyon, ji kesên ku bi îradeya gelê me hatine hîlbijartin, ji piştigirîya tevgera rizgariya neteweyî, sazî û şexsiyetên neteweyî pêk tî.



# FAL



## BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)

Di têkiliyên xwe yên hisî de hûn bê îstixrar in. Gelek caran hûn naxwazin sebebên tenêbûna xwe bi awayekî realîst fêm bikin. Kî çi dike bi xwe dike. Ger hûn jî ji tenêbûnê razî bin, dev ji van xûy û xisletên xwe bernedin.



## GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Belkî we diqet kiriye, di van rojên dawîn de kesên din dixwazin hûn li gorî baweriyên wan hereket bikin. Lê ew ji bir dikan ku mirovên wekî we li gorî prensîbên xwe dijîn. Gelo hûn jî fikirîne ku ne ji we be, wê halê dinyayê çawa bûya?



## CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Carinan hûn xwe nas nakin, an jî naxwazin xwe nas bikin. Gelek caran hûn ne li gorî hisên xwe hereket dikin. Yanî hûn hisên xwe ji xwe re vedîşêrin. Hinekî jî tersa vî karî bikin, bê ka çawa dibe.



## KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Ji bo demekê be jî hûn ji aliyê psîkolojîkî ve di dewreke tevlihev re derbas dibin. Li aliyekî kêf û li aliyê din jî tirs; ji aliyekî ve xem û keder û ji aliyê din ve zewq û sefa. Ji bo ku hûn jî vê dewra xerab derkevin, lazim e hûn bawerîya xwe bi xwe bînin.



## ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Hûn ji gelek aliyê ve xwediyê îradeyê xurt in. Lê ev xurtbûn, bi we re pesindariyê vala çêdike. Ji bo vê yekê jî hûn van rojan li siheta xwe miqate nabin. Bila aqilê we li serê we be. Nexwe gava serê we li qebrê ket, dixtor hew dikarin we xelas bikin.



## SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Gelek caran hûn bêhemdê xwe rexneyên zêde li derdora xwe digirin. Li gorî we, lazim e kêmasiyên insanan li rûyên wan bêne gotin. Di vê meseleyê de israra we, bi we re asabi-yetekê çêdike. Hinekî jî bala xwe bidin başiyên insanan.



## MÊZIN (24 Rezber - 23 Hewçêr)

Hûn li bexteyariyê digerin û dixwazin hema zû bidest bin. Lê hûn nikarin bibin hakimê dudiliya xwe. Ji aliyekî ve mantiqê we û ji aliyê din ve jî hisên we. Nifteya bexteyariyê di destê we de ye, yanî insan mîmarê qedera xwe ye.



## DÛPIŞK (24 Hewçêr - 22 Sermawez)

Bi piranî hûn heviyên xwe dikin qurbana kaprîsên xwe. Yanî qurbûna we nahêle ku hûn bi awayekî realîst hereket bikin. Lê hema xwe berî nav bêhêvîtiyê jî nedin. Kî zane, belkî di van rojan de xebereke baş, ji bo we bibe sebebê hêviyên nû.



## KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Bi dilekî saf û bi niyeteke îdealîst hûn xwe dispêrin insanan. Gava cewtiyekê jî dikin, hûn bi wan re şer dikin. Lê dû re, hûn pê dihesin ku we karekî nebaş kiriye û ji wan lêborîna xwe dixwazin. Pêşiyên me çi gotine? "Dawîya sebrê selamet e".



## KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Ji ber îhtirasên we, bala we li cihên bilind e. Hûn gelek caran jî, îhtirasên xwe vedîşêrin. Gava hûn bisernakevin, rûhiyeta we xera dibe. Ji bo vê yekê jî "Karê xwe bikin biasas, bila dilê we neke wasewas".



## DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Li derdora we herkes qala henûnî û bêdengîya we dike. Yanî zirara we nagihîje mîşekê jî. Dinya xera bûye, xera nebûye ne xema we ye. Belkî ji çend hefteyan carekê li rojnameyan dinîhêrin û hûn van tiştan meraq nakin. Yanî bravo ji we re!



## MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)

Dibe ku di van deman de mirov an jî dostên we, li benda ziyaretekê bin. Ji bo we jî wê bibe guherîneke baş. Rêwîtiyên wiha, belkî şermokiyê jî ji ser we rakin. Ji bo vê yekê jî ziyaretkirina dostan îhmal nekin.



## Selîmoyê dîn û Çetoyê Cemîl

Çetoyê Cemîl, mirovekî dewlemend, politik û xweyî eşîr bû. Rojekê sê hevalên Çetoyê Cemîl têne Misircê (Kurtalan). Ew hevalên xwe li sükê dibîne. Kêfxweşî didine hev û radi-bin diçin qehweyê. Çetoyê Cemîl dinêre ku Selîmoyê dîn, di quncikê çayxaneyê de bi hevalên xwe re leqaleqê dike. Çeto gazi Selîmo dike, hinek pere dide wî û dibêje, "Selîmo lawo! Here bi vî pereyî 4 kilo goştê beranan bistîne û bibe mala me. Ji jinxala xwe re bibêje bila savareke xweş li ber wî goştî çêbike. Mêvanên me ji cihekî dûr hatine, emê êvarê bêne malê." Selîmo dibêje, "Ser serê min û ser çavê min ez xulam" û diçe. Di rê de kûr û dirêj difikire û ji xwe re dibêje, "Weleh ev sê sal in ku goşt neketiye mala me, devê zarokên min bi goşt neketiye. Ezê vî goştî bibim nava zarokên xwe, zikê wan pê têr bikim, bila ji xwe re îşev kêf bikin. Nêzikî êvarê Çetoyê Cemîl û mêvanê wî berê xwe

didin malê. Hê li ber derî ne Çeto diqire, "Hermet şîva me raxîne (amade bike) mêvanê me birçî ne. Hermeta wî şorbeya mişewşê (nîsk) û pîvazê tîne datîne ber wan. Li mala dewlemendekî wekî Çetoyê Cemîl û tenê mişewş... Çeto bi hêrs radibe ser xwe û qîrêkê dide jina xwe. Dibêje, "Ka goşt û savar?" Pîreka wî dibêje, "Goşt û sawara çi?" Çeto dibêje, "Min çar kilo goşt dan Selîmoyê dîn, şand malê qey nehat?" Bermaliya wî dibêje, "Na!" Çeto dibêje, "Wey Selîmo qey tu bi destê min nakevî bilaa bila..." Roj û meh derbas dibin Çeto çar kilo goştê xwe jîbir nake. Radibe rûdine, difikire ku Selîmo bixe faqê ku heyfa goştê xwe jê hilîne. Rojek ji rojan; tuwaleta mala Çetoyê Cemîl dişime û diwarê hewşa wan tê xwarê. Çeto li sükê çavê xwe li Selîmo digêrinê ji bo ku wî bîne, bide şixulandin û pere jî nedê. (Ji bo heyfa çar kilo goşt) Ew Selîmo dibîne hal û mesele jê re dibêje, "Selîmo lawo! Here tuwaleta me veke

û diwarê hewşa me lê bike, êvarê were ezê yewmiya te bidim te." Selîmo dibêje, "Bila be xalê Çeto canê te sax be, ezê vêga herim çêbikim." Selîmê min û te radibe diçe sûka Misircê, "çayxaneya emeleyan", ne yek, ne dido bi kêmayî sê emeleyan digire û ji wan re dibêje, "Herin tuwalet û diwarên Xalê Çeto çêkin êvarê herin perê xwe jê bistinin." Emele milan dipêçin. Xebata tuwalet û diwarê heya nivro xelas dikin û diçin ji bo yewmiya xwe bistinin. Xalê Çeto dibînin û diçin ser civata ku lê rûniştiye. Dibêjin, "Xalê Çeto me tuwalet û diwarê hewşê çêkir. Em hatine yewmiya xwe dixwazin." Çeto şaş dibe û dibêje, "Kê ji we re got? Lawo, min ji bo wê xebatê Selîmo girtibû." Emele jî dibêjin "Weleh Selîmo ji me re got." Wê çaxê fêm dike ku Selîmo ew xapandiye û dibêje, "Lawo Selîmo! Te dîsa zora min bir, çar kilo goşt ji te re sihet û xweş helal be." **SALIHÊ KEVIRBIRÎ**

## Şindo û muhendîs

Şindo, li bajarê Çepexçûrê (Bîngolê), li qezaya Bongolanê (Solhanê) li gundê Exikê jîn dibû. Dema ku yek bihata gund pêşî diçû mala wî. Rojekê ji bo pîvana arziyê, muhendîs têne gund. Yekser diçin mala Şindo. Dixwin, vedixwin û pê re bi tirkî mijûl dibin. Şindo gelek mêvanperwer bû. Tirkiya wî gelek qels û hindik bû. Nikaribû bi muhendîs re rind biaxiviya. Muhendîs pîvana erdê E-


xikê diqedînin. Dixwazin herin gundê Kehmutê. Lê rîya gund nizanin. Ji Şindo dixwazin ku ji wan re rêbertiyê bike. Şindo dikeve pêşiya muhendîsan, diçin ber cem. Bi zaravayê kirdkî (dimilkî) ji wan re wiha dibêje: - Wavêr la, navêr la, çix tepeye, Kehmut êseno. (Wî aliyê cem, vî aliyê cem dihere serê gir, Kehmut dixuye) Muhendîs ji gotina Şindo pir fêm nake. Dema ku Şindo

bi destê xwe îşaret dike, muhendîs pê derdixist ku gund li kîjan aliyê dikeve. Şindo û muhendîs baş ji hev fêm nedikirin. Şindo bi tirkî rind nizanibû. Îro em jî nikarin bi kurdî biaxivin. Werin em dest bidin hevûdin û kurdî hîn bibin. Rewşa ku Şindo tê de bû, ne şerm e. Ji ber ku wî bi zimanê diya xwe xeber dida. Lê ya me şerm e ku em nikaribin bi zimanê diya xwe xeber bidin. **EYÛP DEMİR**



# XEWNA ŞEWITÎ

EV ÇÎROK SALA ÇÛYÎ LI KURDISTANA ROJAVA DI PÊŞBAZIYA ÇÎROKAN DE VÊ ÇÎROKA XELATA YEKEMÎNTIYÊ STAND



Nayifo, derbasî qehweyekê ji qehweyên Amûdê bû. Berê xwe da maseyêke vala. Li ser kursiyê rûnişt, herdu enîşkên xwe dane ser maseyê, serê xwe xiste nav destê xwe û fikirî:

Ez bi ku ve diherim, derî girtine, min pêncî sal derbas kirine. Karên giran nema ji min tîn, ka xortaniya min a berê?! Wey mala kalbûnê xera bibe, ez bûme sofiyê mala şêx. Min tiştêk ji şorbenîskê pê ve nedît, bû me meleyê gundekî. Wehabî bi du min xistin, heta niha jî ez nizamim Wehabî çi ne û kî ne? Bûme qaçaxçî, min lingê xwe li ser kir, min li deriyê dewletê jî xist, ji bo min bikin berdestê dibistanekê. Ji min re gotin, "çênabe tu ecne-bî yî?!"

Bav û kalên min ne çnebi bûn, dema bavê min şerê Fransayê dîkir, Casimê Şemmerî bişkul li Beriya Dêrê dîdan hev!!

Di toşa Amûdê de, kalkê min tiving belav dîkirin û gule berdidan firokên fransî. Wekî qedera reş topek bi ser de hat ew kuşt.

Ka ez ecnebiyê kîjan newalê me?!

Bi vê porspîbûna xwe û bi vî lingê seqet, ez li sûka Amûdê bûme hembal, lê êdî hew ji min tîn. Hema lawekî min hebûya wê alî min bikira. Lê Xwedê, ji kerema xwe re heft keç li ser hev weke rojên hefteyêke zivistanê dane min, heft zikên birçî, heft devên vekirî..

Bawer bike ez derewan nakim, gersonê qehweyê Mecîd ji Nayifo re got, "Girê Mozan kevnare ye, tijî zêr û tiştên entîke ye. Ji Ewrûpayê xelq tîn tiştên entîke jê derdixin. Min bi xwe şevêke erd li wir kola, min du pûlikên zêr dîtin."

Nayifo baş guhê xwe dabû Mecîd, Mecîd jî bi dengêkî nizm diaxivî. Di nav hime hîma qehweyê de bi zor dengê wî diçû Nayifo. Nayifo demêke ne hindik bêdeng ma, fikra wî çûbû Girê Mozan û zêr û entîkeyên wî girî. Mecîd ramanên wî birîn û jê re got:

Bawer bike ez rast dibêjim, here wir erdê bikole, lê bila kes bi te nizanibe.

-Çima?

-Eger dewlet bi te bihese, te zêr dîtibe ne dîtibe wê bibêje: "Ka derxe te çi ditiye?!"

-Ev jî tê de heye?

Lekan: "Ne ew mesele bûya wê xelkê tev ev kar bikira, xelkên Amûdê di dû rojan de wê ew gir weke erdê bikirana."

-Lê eger min tiştêk nedît?

-Ya sîdî!! Ew jî riyek e, îşev nebû, yeke din, tu diz bî şevê reş pir in!

Amûdê, wê nivê şevê kira-sekî ji tariyê li xwe kiribû, Nayifo ji mal derket, heta jina

xwe jî bi xwe nehesand.

Hûr mûrê kolanê û fanosek bi xwe re rakir û çû, li ser rîya Qamîşloyê li otomobîlekê siwar bû, li nêzîkî gir daket û berê xwe dayê.

Ewrekî reş weke derdên evîndarekî, ezman wergirtibû, yek çipikên baranê dihatin. Nayifo dikuliyê û di dilê xwe de digot: "Ez li tiştêkî entîke yî hêja rast bihatîma pir baş bû, minê deynê xwe bidana, kirya xênî bida, minê ji xwe re xaniyek li Qamîşloyê ava bikira.. Na li Amûdê çêtir e.. De li ku be wêk hev e.."

Di nav wan xewnan de, li kevirekî di nivê rê de likumî, hinekî tirsîya, lê dîsa vegeyriya

xewnên xwe...

Eger entîke mezin be ezê çawan hilgirim? Xwezî min diya zarokan jî anîbûya.. Aa-ax!!Niha lawekî min hebûya wê alî min bikira..

Baran hinekî xurt bû, ji dûr ve şewqa birûskan xuya dîkir, gurmîna tavan weke defa gundekî dût, giran dihat. Nayifo bêhemdî xwe, her deh gava dimeşîya li pişt xwe dinêrî, ditirsîya hinek bidin dû wî, lê tiştêkî xuya nedikir. Çirên Mêrdîn di nav çipikên baranê de xuya dîkirin, weke hêviya dîtina tiştêkî entîke di dilê wî yê bi tirs de.

Tirs û hêviyê di dilê wî de şer dîkirin, tirsê şeva reş..

Tenêti.. Tirsê ku kes pê bihese û hêviya dîtina entîke.

Ji nişkê ve bû şîqşîqa birûskan, ew çol tev di roniyê de man, Girê Mozan weke dêwekî efsaneyan xuya dîkir.

Baranê dayê, te digot hinek ji jor de avê bi satilan dirîjnî ser darên tiyan. Nayifo şil bû, cilên wî bi laşên wî ve qemîtin, milê wî jî hilgirtina bêr û koling (qazme) diêşîya, di navbera wî û Girê Mozan de, du sed metre mabûn, hinekî lezand, birûskan jê re rê ronî dîkir.. Ew ditirsandin jî.

Her ku şîqîniya birûskêkê dihat, Nayifo gazekek çeng dibû, lê dîsan serê xwe dixist nav milên xwe û dimeşîya.

Nêzîkî li binaniya gir kir, av jê dinuqutî, çokên wî dile-rizîn, lêvên wî weke pelên daran dirikrikîn, lê dîsan xwe vêsî nekir û weke kêvroşkekê bi gir ve hilperikî, heta gihîştê serê.

Amûdê jê ve xuya bû weke yekî ku xwe di bin sulavekî de dişo. Bi xemgînî lê nêrî, jina wî, heft qîzên wî hatin bîra wî. Du hêstirên germ ji çavan herikîn, hêstir û xwedan û çipikên baranê li ser rûyê wî bûn lehiyek.

Piştê xwe da Amûdê..Bêr û koling ji ser milê westiyayî danî û bi niyaz berê xwe da ezmanê tarî û bi dengêkî hêdî û westiyayî got:

- Ya Reb, tu mezin î.. Tu min poşman li zarokên min venegeerî!!

Û kelegirî bû..

Dest avête bêrika xwe, çixat derxist, fanosa xwe vexist û li kêleka xwe danî û bi bismillah dest bi kolanê kir.

Bi tiliyên xwe yên dilerizîn, binê kortê vexepirand, ji nişkê ve destê wî li tiştêkî hişk ket, dilê wî weke masiyekî nû ji avê derketibe, kire teperep. Hêvî û tirs û kêfê di dilê wî de govend gerandin

- Ev e...

Bi dengêkî bilînd Nayifo ev peyv got û bi dilovanî, axa şil ji ser wî tiştî da alî, hinekî leqand û ji kok ve weke gîzerêkê hilkişand.

Bêhemdî wî, dengêkê pê ket, ew tiştî ji dest xwe avêt û bi lez ji kortê derket, zimanê wî zîwa bû, pirça wî gij bû, çavên wî fireh bûn. Bi wî halî demêkê dûtî kortê ma, nema wêribû li kortê binêre, lê hin bi hin bi ser xwe ve hat, bi xwe kenîya û got:

- Wax... Nayifo wax! Tu yê ku leşkerê Tirk ji te ditirsîyan... Tu yê ku di şeva reş de sînorê tev bi mayîn û bombe derbas dîkir... ji vî qafê riziya-yî ditirsî?! Heyfa te!!

Cegermendîya wî lê vegeyriya, dakete kortê û ew qaf rakir ku biavêje, lê di dilê xwe de got:

- Belkî tiştêkê tê de hebe?! Çima biavêjim?!

Herdu kortikên çavên wî, qaf tijî ax bûn, hestiyê poz maşiyabû, çena jêrîn tune bû... Lê qafekî giran xuya bû, ew qaf şikand. Ji axê pê ve tiştêk nedît. Çira hêviya wî melûl bû, lê venemirî, hestiyên xwediyê qaf yek li dû yekî derketin parsû... pî... zend... hêt...

Nayifo hinekî xemgîn bû û got: "Çi heqê min li vî kesî hebû, min gora wî vekir, ma nebe ew jî bextereşekî wek min be di wexta xwe de!" Kolana xwe berdewam kir û dîsan bû şîqîna birûskêkê, ew dever di ronaya birûskê de veketin.

Gundiyeş li şevbuhêrkan bûn, tevan gotin:


- Birûsk li Girê Mozan ket.

JAN DOST



WELATÊ ME LI SER MUZÎKA GELÊRÎ Û ROJAVAYÎ


# GEREK E STRANÊN EVÎNÎ JÎ PÊŞVERÛ BIN



**H**unermendê kurd Ciwan Haco di sala 1957'an de li rojavayê Kurdistanê bûye. Ji biçûkahiya xwe ve di nava muzîkê de û bi stranbêjên kurd re jiya ye. Muzîk bûye parçeyeke mezin a jiyana wî. Ciwan li ser muzîkê, ji xeynî tiştên ku ji muzîsyenên kurd ên gelêrî hîn bûye, perwerdehiya akademîk jî li Ewrûpayê ditiye. Li Almanyayê du salan dersê gîtarê standiye û ilmê muzîkê jî li zanîngeha Bochumê xwendiyê. Mirov dikare bibêje ku Ciwan kelepora muzîka kurdî bi stîl û teknîkên pêşketî yên rojavayî xemilandiye. Bes, ev texlîdê muzîkê wisa xuya ye ku ji bo gel hinekî biyan e û gel hê jî zêde hînî vê terzê nebûye. Li ser vê yekê wiha dibêje: "Bi rastî ez zêde li guhdaran nafikirim. Dema ez stranên xwe çêdikim tu niyeta min a xapandina guhdaran nîn e. Rast e, kurd hîn baş hînî vê texlîta muzîkê nebûye. Lê gerek e bê zanîn ku ev texlîta muzîkê li Rojavayê muzîkeke gelêrî ye û gotinên stranên jî bi giştî gelêrî ne." Ciwan Haco bi me dide zanîn ku di havîna pêşiya me de wê kaseteke nû derxe û ev kaset wê bi giranî ji stranên siyasî çêbibe. Kasete Ciwan Haco ya dawî "Dûrî" berî du heftiyên derket. Heta vê gavê heşt kasetê wî derketibûn. Ciwan niha li Norwecê dijî.



BI HUNERMENDÊ KURD CIWAN HACO RE PEYIVÎ:



**"Li Kurdistanê jî derwêşan zikrê (binavkirina xwedê) xwe li ber lédana 'erbanan' digotin û dibêjin. Di batizmiyê êzîdiyan de, li ber Merqeda Şêx Adî û di roja sersala kurdî (şerqî) de qewal her û her mîna beşeke girînga îbadetê amade ne û li ber dengê elebanê û bilûrê qewlên êzîdiyan dibêjin. Ez baş nizanîm ji kengê ve qewal tembûrê bi kar tînin, lê belê tu dikarî bêjî ku îro her mirovê qewal tembûrvan e jî."**

**M**uzîka kurdî tevî meqam, rîtm, melodî, amûrên wê ve mirov dikare bi çi bide ber ên gelên din?

- Muzîka kurdî pir kevînar, dewlemend û pireng e. Ji Lorîstonê ji başûr bigire û ta Meresê û Qersê, sînorê me bi tirkan û lazan û ermeniyar re heye, ez bawer nakim pirengiyê wisa di warê muzîkê de li ba tu mîletên cîran peyde bibê. Ji aliyekî din ve muzîka kurdî hem tesîr li muzîka cîranan kiriye û hem jî ji ya wan tesîr girtiye; yanî tu dikarî bibêjî îro hemû meqamên di muzîka şerqî de hene, di muzîka me de jî hene. Lê belê, gelên din xwedî sazgeh, amojgeh û zanîngeh in û em bêtî her tiştî ne, kelepora me tê talankirin û ji dagirkeran re dibe mal. Muzîka me îro beşeke wê ya mezin li derbederiyê, di bin hoyên dijwar de tê afirandin. Li Kurdistanê Bakur bêhtirî nivê gelê me zimanê dayika xwe ji ber zilma sedan salan ji bîr kiriye û muzîka xwe jî pê re. Ji ber vê yekê ez dibînim bêdadî ye eger mirov muzîka kurdî û ya gelên din têxe yek mîzînê û bide ber hev.

**Di muzîka gelekî de hestiyê piştê tê çi wateyê?**

- Hestiyê piştê, di laşê mirov de radîhêje gewdeyê wî mirovî û dihêle ku piştrast bimîne û nahêle bikeve. Vêca di muzîka kurdî de çi bi vî erkî radibe ne hêsan e ku mirov bibêje. Bi bawerîya min avahiya muzîkê dê bihêrive (hilweşe), eger riknek ji riknên wê ne li cihê xwe be. Lewma, hemû faktorên ku muzîka kurdî çêdikin mîna hev girîng in. Ji xeynî vê, bawer dikim ku muzîka me hîn bi giştî folklorî ye, çi ji aliyê awaz û rîtmên xwe ve û çi ji aliyê amûrên xwe ve. Ji bona muzîkeke kurdî ya pêşketî gerek e em dereceya pêşî lawik, heyran, dîlok û stranên xwe yên şîne, paleyîyê û şeran berhev bikin û di nav xelkê de belav bikin. Hêvîdar im min hinekî bersiva pîrsê dabe.

**Tu qet li ser awayê strandîyê ya dengbêjan rawestiyayî, heke rawestiyabî teknîkeke wan heye gelo?**

- Bêguman erê. Stran bêtênîk ne mînkûn e û dengbêj jî hin caran ji stranekê, heta bi stranekê, teknîkeke cuda bi

kar tîne. Stran heye gotîna wê asê û zehmet e û karekî mezin ji mirovê dengbêj dixwaze. Dengê dengbêjan jî, ji hev cuda ne û ev dihêle ku dengbêj teknîkên cuda bi kar bînin. Lê, hêjayê gotîneyê ku teknîkên baş û xerab nîn in, hemû wekî hev baş in, lê belê yek teknîk dibe ku ji aliyê dengbêjekî ve bi awayekî delal û rind bête bikaranîn û ji aliyê yekî din ve ne ewqas baş.

**Tê gotin ku rengên hin şeweyên muzîka ku Rojavayî çêdikin di ya kurdî de jî hene. Wekî 'rap'ê.**

- Rap stîleke ji stîlên muzîka pop a reşan e û taybetiyêke rapê ew e ku dengbêj bi awayê qisekirinê di gel muzîkeke bîrîtm stranê dibêje. Gotîna "rap" bi xwe jî di zarê reşîkên Amerîkayê de tê wateya axaftinê, qisekirinê. Pir caran dengbêj stranên, wekî çawa kurd dibêjin, "li ser piyan" çêdikin. Împrovîzasyon taybetiyêke bîngêhîn a muzîka rapê ye. Di muzîka kurdî de stranên şîne ku li ser miriyan tînin gotin, bi vî awayî ne, lê bi awaz û rîtmekê yekcar cuda û bibêje hema nebiyê ku hacetên muzîkê di gel

hatibine bikaranîn. Rojavayî bi tebieta xwe mîjîvekîrî ne û muzîka wan îro ketiye bin bandora muzîka her çar nîkarên cîhanê; lewma dikeve aqilan ku mirov şopa hin cureyên muzîka Rojavayî di muzîka kurdî de bibîne.

**Gotin zehf gelêrî û herêmî, melodî û hacetên muzîkê ji gelek biyanî ne. Em dikarin bibêjin ku tu bi gotinan, xwe bi muzîkhezanan didî guhdarkirin?**

- Bi rastî ez gelekî li guhdaran nafikirim. Dema ez stranên xwe çêdikim û tu niyeta min a xapandina guhdaran nîn e. Muzîka min rast e li Kurdistanê zehf kes hêştî piş pê nakin û guhên guhdarên kurd hîn baş neketiye ser vê texlîta muzîkê, lê gerek e bê zanîn ku ev texlîta muzîkê li Rojavayê muzîkeke gelêrî ye û gotinên stranên jî bi giştî gelêrî ne.

**Xebateke kurdên Ermenistanê li ser "muzîka kurdî ya nûjen" hebû. Koma Weten, ku em dikarin wan jî di kategoriya we de bi nav bikin. Tu bi çi awirî li wan dinihêrî?**

- Mixabin ez Koma Weten baş nas nakim, ev

jî kêmasiya min e. Lê rast e, van salên dawî dengbêj û komên teze hatine pêş ku tu dikarî, çawa we got, wan tîxî kategoriya "muzîka kurdî ya nûjen". Ji kesên wekî min re ev cihê kêfxweşiyê ye û nîşana wî tiştî ye ku muhtacî bi pirengiyê heye di muzîka kurdî de.

**Çi pêwendî heye di navbera muzîka ku bi sazê lê tê dayîn û mîstîsîzmê de?**

- Mirovên ayînê yên ortodoks ji destpêkê ve muzîk red kirin. Ji ber ku wan lê dinêrî mîna ku dibêjin kêfa şehwanî. Civatên sofî reqs û guhdarkirina muzîkê mîna beşeke ji teqsên îbadetê dane pêş, lê vê yekê hişt ku dengên heramkirina muzîkê hîn bilindtir bibin û dawî wisa lê hat ku muzîka sofî terka piraniya awaz û amûrên îlmanî (secular) kir û hinekan jê mîna şî'yan yekcarî terka muzîkê kirin. Şerefxanê Bedlîsî di Şerefnameya xwe de behs dike ku Mîrê Bedlîsê lédana hacetên muzîkê û stranên di heftrojên daweta kurê xwe de, bi navê îslamê, yekcarî qedexe kirin. Hinek terîqetên dewleta Osmanî mîna terîqetên mew-

lewî, qadirî û rifa'î ketin bin bandora bihêz a muzîka îlmanî û bi vî rengî şeweyên muzîkê yên mîna saz semaîsî xuliqîn.

Li Kurdistanê jî derwêşan zikrê (binavkirina xwedê) xwe li ber lédana 'erbanan' digotin û dibêjin. Di batizmiyê êzîdiyan de, li ber Merqeda Şêx Adî û di roja sersala kurdî (şerqî) de qewal her û her mîna beşeke girînga îbadetê amade ne û li ber dengê erbanê û bilûrê qewlên êzîdiyan dibêjin. Ez baş nizanîm ji kengê ve qewal tembûrê bi kar tînin, lê belê tu dikarî bêjî ku îro her mirovê qewal tembûrvan e jî. Li Kurdistanê Rojhilat mezhebê ehli-heq heye; ew bawer dikin ku mirovê bawermend û olperest bi riya muzîkê dikarin xwe bigihînin sirên mezhebê ehli-heq. Ji sedan salan ve erbane, bilûr û tembûr sê hacetên wan ên pîroz bûn, lê îro tenê tembûrê bi kar tînin û bi çavê haceteke pîroz û muqedes lê dinêrin.

Hêjayê gotîneyê ku kurdên elewî jî li tembûrê yan jî li sazê bi çavê aleteke pîroz dinêrin.

Dewam Rûpel 10



# Gerek e stranên evînî jî pêşverû bin

Hinek kes muzîka te, bi taybetî jî parçeyên li ser evînê, dişibînin arabeskê. Yanî tê gotin ku ji hêviyê zehfir, ew parçe xemgîniyê bi mirov re çêdikin. Gelo tu vê tesbîtê rast dibînî?

- Xwediyên vê gotinê yan baş nizanin arabesk çî ye û yan jî muzîka min nas nakin. Gotina "arabesk" bi eslê xwe ji Îspanyayê, ji jêdestê Mûriyan hatiye. Gotin di destpêkê de di warê arkîtektûrê (mîmarîyê) û resim de hatibû bikaranîn û paşê di warê muzîkê de jî hat bikaranîn. Arabesk tê wateya bîranîna zexrefê û neqşan û her tiştê ku li hunerê bête-zêdekirin, ji bona xatirê bedewiyê. Di muzîkê de armanca wê ji pîrengîtiyê bêhtir ji bandora atîfî (emotional) ye. Yanî eger stranên min ên evîniyê xemgîniyê bi mirov re çêdikin, wekî hûn dibêjin, nexwe ew tersî konsêpta arabeskê ne.

**Di kasetên te de hem parçeyên şoreşgerî, hem jî yên evînî û heta tê de gotinên mustehcen jî hene. Li ser vê pîrengiyê tu dikarî çî bibêjî?**

- Evîn yek ji pîrsên jiyane ye ku pareke mezin ji hest û karî û wexta mirov dibe. Gelo kî heye dil neketibe yekî yan yeke din. Di civateke li paşmayî de wekî ya me, ku bîr û baweriyên kevnesalan ta roja îro tê de mane, dibine seba bi hezaran trajediyên, ji ber ku hin kes hene dixwazin bi navê olê û bi navê namûsê evînê qedexe bikin. Strana evînî gerek e roleke wê yî pêşverû hebe, di prosesa guherînê civakî de. Gotina stranên şoreşgerî jî, ji hoyên welatê me tê, welatê me di nava şoreşa azadiyê de ye û erkê me dengbêjan ew e ku em nav di welatiyên xwe bidin yên ku di nava cengê de ne, em navê şehîdên xwe, navê bajarên xwe yî serhildêr, navê çiyayên xwe, asêgehên şervanên azadiyê, her û her li rûyê dinyayê bihêlin.

Ez pîrsa gotinên mustehcen di stranên min de rast nabînim. Eger ez ne şaş bim meqsed bi "gotinên mustehcen" hin gotinên ku di parçeyên folklorî de derbas dibin in. Rast e gelek gotin hene em îro di civatan de nabêjin, mîna mesela "memik" û "te ez helandim", lê belê eynî gotin gava di kontêksta wêjeyî de tên gotin, wekî di stranê de yan di helbestê de, giranî û dijwariya wan î sincî sivik dibe û

hêsantir tîr pejirandin. Wekî din jî, bi bawerîya min, civata kurd hingî şaristanî (medenî) dibe, bêhtir dibe civateke purîtanî û pîrs û kelemên sincî (exlaqî) ji xwe re derdixe. Gundî bi nefsbîçûkiya xwe bêhtir bi rihetî dikarin behsa wan tiştên muherrem bikin.

**Li ser muzîka Mihemed Şêxo tu dikarî çî bibêjî? Çima dengê wî û muzîka wî (bi yek tembûrê tenê) ew çend tesîrê li mirov dike?**

- Mihemed Şêxo yek ji sê hunermendên kurdî ye ku, pêşketineke girîng xistine nava strana kurdî li Kurdistan û Sûriyê. M. Şêxo, Seîd Yûsiv û Mehmûd Ezîz strana kurdên vî beşê welatê me, ji warê wê yî folklorî yê xwerû derxistin û muzîkeke bêhtir bi reng, pirbeş (murekeb) û pirdeng anîn meydanê. Bi rastî berî her sêyan jî Aramê Tigran tovên vê guherînê avêtibû. Lê çima nav bi Mihemed Şêxo ket, bi bawerîya min, seba tebieta babetên stranên wî bû. Stranên M. Şêxo bêhtir girêdayî welat û êş û kul û derdên gel bûn. Wekî din jî M. Şêxo xwedî dengê zelal û melûl bû ku, kurd jê hez dikin. Muzîka M. Şêxo bedew e. Muzîka bedew her bedew e, çî bi yek tembûrê bête gotin û çî bi beşdariya tîpeke sax. Eger hin awazjen hebin û stranên M. Şêxo ji nû ve bi belavkirineke muzîkî yî teze binivîsin, ez bawer im dê muzîkeke pir xweş û bedew jê derkeve. Di muzîka wî de qabiliyeta pêşxistinê heye.

**Ji roja ku te dest bi muzîkê kiriye ta îro, çî guherînên bîngêhî di jiyana û dîtina te de çêbûne. Mesela Ciwan Hacoyê berî sê salan û îro jî aliyê fikrê xwe ve eynî ye?**

- Bêguman na. Di van salên dawî de gelek tişt li dinyayê qewimîn ku mirov neçar dihêlin ji nû ve li bîngêhî fikrê sosyalîzmê vegere. Hêrtîna (hilweşandin) sistema sosyalîst wekî avahiyeke ji xweliyê derbeke dijwar bû li fikrê sosyalîzmê ket û mirov wilo pê dihesa ku êdî alternatîvek jî vê dînya tîjî bêdadî re nîn e. Ev rewşeke gelekî zehmet e. Bawerîya min ew e ku ev dînya îro li ser gelek neheqî heye, her dê hinek serî li ber rakin. Şerê gelê kurd jî, ji bo destxistina azadiyê û edaleta civakî dihêla ku mirov bihêvî be.

Hevpeyvîn: Welatê Me



## GERÎLA RIYAN DIDE GIRTIN

Ji destpêka sersalê ta 11'ê meha rêbendanê livbaziyanê gerîla, li hemberî hêzên dewletê û cerdevanan dewam kirin. Li gelek deveran jî bi şevan rê di bin kontrola gerilayan de bûn.

6.1.1995

Di nava Nisêbînê de gerilayên ARGK'ê erebeyeke polisan gulebaran kir. Derheqê mirî û birindaran de agahî negihîştin destê me.

7.1.1995

Di navbera Amedê û Licê de leşker ketin kemîna gerilayan. 2 leşker mirin, gelek jî birindar bûn.

Li Edeneyê, polisekî bi navê Mustafa Döner ji aliyên kesên çekdar ve hate birindarkirin.

8.1.1995

Di navbera Mêrdîn û Nisêbînê de cerdevanan kemîn avêt pêşîya erebeyekê. 3 endamên JITEM'ê di gulebarana cerdevanan de birindar bûn. Erebeja polisan ya ku birindar dibirin nexweşxaneyê jî di rê de wergeriya, 3 polis birindar bûn.

Gerilayan 4'ê rêbendarê, li gundê Sinê ya Licê, êrişî ser leşkeran û cerdevanan kir. Di êrişê gerilayan de 2 leşker û cerdevanek mirin, 4 leşker birindar bûn.

Cerdevanên gundê Caregiza ya girêdayîyê Agiriyê, sîlehên xwe danîn.

9.1.1995

Serçerdevan Muhacir Atmaca yê nahîya Zilana Wanê, bi destê hêzên dewletê bi sedemê (li ser xwe gerandina) sîleha bêruhet hate girtin.

Li Xaniya girêdayî Amedê, li ser guhdariya bandên bi kurmançî 7 kes hatin girtin.

Gerilayên ARGK'ê li Bismilê sercerdevanê gundê Çetelê, Münir Çelebi û du cerdevan di kontrola rê de girtin û bi xwe re birin.

Dawiya berfanbarê gerilayan êrişî gundê cerdevanan Alûzê kir, di vê cerdê de 3 cerdevan mirin, gerilayan 4 cerdevan bi xwe re birin.

Li Dêrsimê, li navçeya Xozatê Hasan Çiçek ku 40 rojan berî vê windabûbû, cesedê wî yê şewitandî, hate dîtin. Li gorî malbata wî yên ku Hasan Çiçek girtibûn, hêzên dewletê bûn.

Şûbeya 'Ülkü Ocakları' (argunên armançê) ya Pendikê û nûneriya 'Ülkü Ocakları' ya li Ikitelli hatin bombekirin. Ev livbazi TIKB (Yekitiya Komünistên Şoreşger ên Tirkîyeyê) girtin ser xwe.

10.1.1995

Di navbera Pasûrê û Licê de, gerilayên ARGK'ê hêzên dewletê xistin kemînê. Gerilayan panzerê îmha kirin, gelek leşker

û cerdevan kuştin û birindar kirin.

Gerilayan boriya petrolê ya ku di nava Qubina Êlihê re dibore bombe kir.

Li Botanê, di nava mintiqeya Gelewe û Gerenda de jîpeke leşkerî li mayîna gerîla leqitî. Jîp îmha bû, derheqê mirî û birindaran jîpe de tu salox tûnene.

11.1.1995

Nêzîkî tabûra Misirca Sêrtê, treqtor gundiyan li mayîna leşkeran leqitî. 3 gundî mirin, yek jîbirindar bû.

Li Amedê, li Pîranê, li gundê Pirojmanê, panzera leşkeran gundiyeke perçikand. Gundî mir.

Li nêzîkî Xanî û Licê, di nav gerilayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. 6 leşker û gerilayek mirin, gelek leşker jî birindar bûn.

Gerilayan bi ser kanên(ocax) komirê yên Şernexê ve girt. Kan tehrîp bû. Gelek leşker û cerdevan mirin û birindar bûn.

Li Amedê, li navenda bajarê erebeyeke polisên sivil hate gulebarankirin. Di heqê mirî û birindaran de tu agahî tunene.

Riya Amedê û Mûşê, ji ber êrişên gerilayan ji aliyê hêzên dewletê ve hate girtin.

Girtiyê ji doza PKK'ê Hasan Kahraman, di girtîgeha Sağ-

malçılar de ji ber nexweşiyê mir.

Li Çewlikê hêzên dewletê, minîbûsa gundiyan gulebaran kirin. Gundiyek mir, 9 gundî birindar bûn.

12.1.1995

Li mintiqeya Omeryan ya Mêrdînê, gerilayên ARGK'ê operasyona leşkeran, vala derxistin. Di operasyona de gelek leşker ji sermayê qerisîn, gelek jî firar kir. Gundiyan gelek cesedê leşkeran yê qerisî veşartin.

Li Sasonê, li gundê Hafikê, gerilayekî eniyê bi leşkeran re ketê şer. Gerîla guleya dawîn berda xwe, xwe kuşt.

Li navbera Dihê û Kerborande navbera gerilayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Di şer de gerilayan firokeyek daxist. Gelek leşker mirin û gelek jî birindar bûn.

Li dora Şernexê operasyonên hêzên dewletê didomin. Di operasyonan de li gelek deveran gerilayan leşker xistin kemînên xwe. Derheqê mirî û birindaran de agahî ne ketin destê me.

Di navbera Xanî û Licê de hêzên dewletê ketin kemîna gerilayan. Di kemîna xwe de gerilayan 2 cemsayên leşkerî texrîb kirin. Derheqê mirî û birindaran de agahî ne gihîştin destê me.

Navenda Nûçeyan



Xebatek li ser paşgirên di kurmancî de (4)

# Zimanê me hewceyî ronîkirinê ye

Ez der barê qertafên ku li dawiya nimûneyên wan de, di nava kevanê de nişana pirsê hene, gumandar im. Jixwe mînakeke bi tenê ji wan re hatiye nişandan.

Ji bo "king" a ji ku Prof. Qanatê Kurdo û A. Bali ev wekî paşgir pêşkêş kirine jî, ez di gumane de me. Ji ber ku li Herêma Serhedê bi hêsani ji "birangê min" re dikare "birangê min" û hwd. bê gotin. Bi awayekî din, ji aliyê bilêvkirinê ve jî guherîn çêdibin.

Ez dixwazim li ser hin paşgiran ramanê xwe daxuyînim. Bi ya min, qertafên hene ku bi qonaxa demê re bi hev da-geriyane û li gorî baweriyê min ji hev tîn. Heke ez wan di komê de bi rêz bikim:

- "ak", "ax", "ok" û "ox"
- "ar", "er" û "or"
- "ahî" û "ayî"
- "or" û "ol"
- "ban" û "van"
- "bend" û "mend"

Îcar ez dixwazim paşgirên ku min ew di van heft xebatan de nedîtine û yên ku ji aliyê min ve hatine tespît kirin pêşkêş bikim. Bi rêza alfabe-yê:

at: civat, gulat  
av: palav, delav  
ava: malava, zarava  
bat: malbat, sazbat  
co: nîvco, manco  
çe: nalçe, xaliçe  
çink: mûçink, dewçink  
ele: rewtele, sengele  
gan: bazirgan, çogan  
heng: serheng, leheng  
îne: çavîne, yekîne  
ij: lavij, paqij  
nc: sarinc, qolinc  
ûn: kaşûn, derûn  
ûd: şerûd, sirûd  
wir: çanewir, mizawir  
zar: şermezar, tengezar

Li ser "nc"ê pêwîst e ku ez hin daxuyaniyan bidim. Herfinen dengdêr dikarin bêne pêşiya "nc"ê. Nimûne:

Sar-i-nc, ar-ê-nc, ser-e-nc....

Bi van 17 paşgiran ve, di zaravayê kurmancî de yekûna paşgirên tespît-bûyî digihîje 78'an. Hêviya min ew e ku ev xebat ji aliyê kesên zimanzan ve bê vekolîn û nirxandin, pişt re jî ez bêm agahdarkirin da ku ez karibim careke din lê vegerim.

### ÇAVKANÎ:

- 1- Emîr Celadet Bedirxan, Rager Lescot; Kürtçe Grameri, Doz yayinlari,



Kamûran Bedirxan

Stenbol

2- D. Îzoli; Ferhenga Kurdî -Tirkî, Tirkî - Kurdî, Weşanên Deng, çapa pêşin, Stenbol 1992

3- Prof. Qanatê Kurdo; Gramera Zmanê Kurdî, Koral Yayinlari, çapa dudu-yan, Stenbol 1991

4- A. Bali; Rêzimana Kurdî, Alan yayincilik, çapa pêşin, Stenbol 1992

5- Feqe Huseyn Sağniç;

Hêmana Rêzimana Kurdî, Melsa yayinlari, çapa pêşin, Stenbol 1991

6- Kemal Badilli; Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri, Med Yayinlari, çapa dudu-yan, Stenbol 1992

7- Mûrad Ciwan; Kürtçe Dilbigisi (Kürtmança lehçesi), Weşanên jîna nû, çapa pêşin 1992.

ZANA FARQÎNÎ

## DEFTER

Vejin bêziman nabe



FAYSAL DAĞLI

Zimanzan Feqî Huseyn Sağniç li Berlînê, di hizûra dîrok û konferansvanên kurdî de wisa digot: "Bîst salan berê ez li Tetwanê li malê, di pişt deriyê radayî de, li ser zimanê xwe dixebitîm. Wê demê, min qet xeyalên rojên wisa nedikir. Lê îro, me ev rojan jî dîtî, ku zimanê me li bajarekî wekî Berlînê, ku paytexta çand û zanistiyê ye, di konferansan de tê xebitandin û wekî zimanê cîhanê cihê xwe digire."

Belê, bi rastî, kurtayî ya Konferansa Zimanê Kurdî ya Navneteweyî, ku li Berlînê hate lidarxistin, ev bû.

Kurdî; li Berlînê ew axa ku li serê, axa mirinê heta zereyê dawîn jî, ji ser xwe avêt û wekî zimanê cîhanê nişan da û eşkere kir ku bixwedî ye, bihêz e, bikok e û wê kirasê xwe yê rengîn li xwe bike û bi destên Ehmedê Xanî bigire, li nava rûpelên dîrokê û li rûkê cîhanê bigere. Berî her tiştî, bi hemû kêmasiyên xwe ve jî, mirov kare bibêje ku ev konferans, wê bibe taca serê ronesansa kurdî.

Bi rastî li gorî fikra min wateya ronesansê, careke din hate dîtî ku ji bo kurdan hinek xastir e. Ji bo me wateya wê, vejîna neteweyî ye.

Vejin jî bêziman nabe. Şer bêziman nabe. Ziman jî bêşer nabe. Konferansa Berlînê di şerê vejîna kurdî de, bû kozikeke herî girîng. Konferans ne tenê bi wateya teng, serfiraz bû. Ji aliyê din ve jî pir tişt nîşanî me dan. Ya pêşî ev bû ku, mirov bi dilê germ kare bibêje, kurdan bi çand û zimanê xwe, şexsiyeteke rewşenbîrî ava kirine. Ev jî rewşenbîriyeke nûjen e. Ev şexsiyet pirsgerêka pisporiya

xwe zane, bi disiplinê, bi tewayetî ye û kurd e. Konferans bi vê şexsiyete li dar ket. Ev rewş jî, ji bo kurdan qonaxeke nû ye. Ziman saziyeke civakî ya bican e. Wekî mirovan ew jî dijî. Bi wan re dijî. Ew di nava mirovan de ye, mirov di nava wê de ne. Ji bo vê yekê, jiyana ziman û mudaxeleya ku lê çêdibe, li gorî mirovên ku pê re dijî û lê mudaxele dikin, şexl digire. Yanê, zimanê kurdî piştî vê kozikê, wê hê jî bi nûjenî, bi disiplin jiyana xwe bidomîne. Ew û rewşenbîrên kurd wê hê jî şerefê bidin hev. Û ev rastî ji aliyê tu hêzan ve nayê sekandin. Zimanê me wê wekî kulîlkan, betonê, zemîna herî hişk biqelişîne û ji asîman re bibêje merheba. Gerek mirov qala hinek kêmasiyan jî bike. Kêmasiya herî mezin, ku ew jî ne qusûra Enstîtuya Berlînê ye, ew bû ku hinek rewşenbîr û zimanzanên kurd nehatibûn.

Di nava van de hinekan xwe bi taybetî jê dîr xistibûn. Ev şerm, ya xwediyê xwe ye û bêwate ye. Bila neyê jibîrkirin ku, ev karwana ku heya vê menzîlê hatiye piştî wê jî wê di riya xwe de bimeşe. Û wek çiroka kiroşk û çiyê wê li wan bideqe. Girîng e rewşenbîrên kurd, xwe li hemberî gelên xwe û dîroka xwe nekin dêla kiroşkê. Bi gotina dawî, em ji sazûmankarê ve konferansê re spasiyek dikin û em ji wan re deyndar in.

# Ronakbîrekî pirreng: M. Alî Ewnî



Di sala 1897'an de, li Sîwêreka Ruhayê, çavên xwe vedike. Xwendina xwe ya destpêkê û navendiyê li bakurê welêt kuta dike. Pişt re diçe Misirê û li Qehîreyê bi cih dibe. Di zankoya (unîversîteya) El-Ezherê de dest bi xwendinê dike û bi pile (derece) yeke bilind wê diqedîne.

Wî zimanên farisî û frensîzî baş dizanibûn. Di sazkirina komeleya Xoybûnê de bi malbata Bedirxaniyan re dibe alîkar. Ji ber ku bi awayekî germî xebatê ji bo gelê xwe dikir, dewleta tirk destûr (izin) nedayê ku vegere bakurê welatê xwe. Li ser vê yekê li Misirê dimîne. Di diwana şah de wekî wergêrê zimanên Rojhilata Navîn tê wezîfedarkirin.

Nivîs û berhemên M. Alî Ewnî

1. Şerefnameya Farisî, ji nû ve diweşîne, piştî ku parawêz û pêşgotinê jê re dinivîse
2. Şerefnameyê werdigerîne ser zimanê erebî û di sala 1958'an de ji aliyê Wezareta Perwerdehiyê ya Misirê ve ew tê çapkirin.
3. Bi erebî pirtûkek li ser pirsgerêka kurd nivîsiye
4. Herdu kitêbên M. Emîn Zekî wergêrandine ser zimanê erebî, çap kiriye. (Xulasey Tarixî Kurd û Kurdistan, Tarixî Duwel û Emarefî Kurd)
5. Gelek nivîsên din, ku li ser kurd û Kurdistanê ne û heta niha nehatine çapkirin.

M. Alî Ewnî, di 11.7.1952'an de çavê xwe digire û li Qehîreyê li Cebel Meqtem, nêzikî gora Omer İbn Elfarid tê veşartin.

Werger ji Soranî:  
BEKIR BAHÖZ



DIK

## Serhildana hiş

Xemso û Zado bi hev re bûn heval. Dan ber rê qederekê çûn. Zado bi hevaltîya Xemso gelekî kêfxweş bûbû. Çûn û çûn... Li ber lingên xwe nediketîn. Bêdengiyekê hawirdor tîji kiribû. Lê, di dilê xwe de Zado her dem dixwest ku Xemso vê bêdengiyê hilweşîne. Ma xema Xemso bû ku Zado dixwest pê re bibe heval! Serî li ber xwe kiribû, diçû. Dinyayeke bêdawî, cihekî xwerû bû. Tebat nediket Zado. Deng lê ket, dengê xizînok bû; tu bi ku ve diçî, Xemso? Ka serê xwe rake malmîrato! Roj tê şev xelas dibe. Xemso diçû. Te digot li ber tofanê direviya. Serî li ber, awir li erdê bejî diketîn. Zado li dora xwe nêrî, di bin asîmanê şîn de tevlihevîyek hebû; xwezayê dikir xuşexuş, deng firşteng (esebî) bû. Di cih de keştiya bayî yelkena/ çar xwe vekiribû, berê xwe dabû rojavayê roja çavfireh û camêr xwe li paş ewrên qalind veşartibû. Li wir ji bo berbangê qet hêviyek tunebû. Dilopên baranê bi pêlên deryayê dilivîyan. Çûkan tûj dixwend, ferman giran û bêhedan bû, gerdûn di rêça/ çerxa xwe ya tazî de sist berdand, digeriya li nêrinên qenc bêhay. Hiş serî hildabûn, di kûrahiya fincana şil de li serketinê digeriya. Zado dengê bihîst: "Êdî ez ne dikarim lingên xwe bavêjim, ne jî dikarim bibînim, bi tenê avzêlên nerm û diwarên çiya yên pir mezin bûn."

MEMO DARRÊZ

Nicolas Vial



# HÊVIYA ÇIMAN

**Ma mêrdimey ra hêviya xwi bibirni? Mêrdimey ra hêvî biriyêna? Çirê zilm endi serdestey keno? Mêrdimeya ki şêna hukim bika vay û varanî, ard û asmênî û heme qul û ganî çirê bena yesîrê zilmî? Çirê semedo ki hukim bika, bena mehtacê zilmî? Bêzilm, hukim nêbeno gelo? Heq, hiquq û hukim çirê pê nêkenî? Çirê herunda zilmî di, hewley û rindey nêbenî wayirê tac û textî? Hukim çirê edeletî ra terseno?**

(KIRDKÎ)

Rojê verînê serra newa di, linga xwi zifqêrda berî ra erzeno teber. Tarî, serd û bêvengey yê ver a yenî. Stokholm di nika hukim, hukimê yîni yo. Şan di gama ki yeno keye, hukimdarê nê şaristanî nêvuriyayî (nêbedeliyayî). Xwira çîdo anasarên nêpaweno.

Yo lez keno ki xeberanê tirkan ser bireso. Yeno zerre. Gedey yê, yê ver a vazdenî. Labelê leza yê esta, goş gedan ra nêkeweno. Yew hewawo ki lezkane şamî weno û cixara xwi zî hema pay ra anceno û şono merata televîzyoni ver di roşeno. Çimê yê seeti di yî. Reklamî. Reklamî... Fekdê xwi di pitpitîyêno. Wazeno wazeno xebera verîni di vajî: "Tirkiya di, lejo ki miyanê dewleta tirkan û kurdan di bi, qediya. Herdi polan pê kerd ki na mesela sey ge-

lek miletanê bînan bêçek û bêceng hal bikî." Ya zî mesela vajî: "Ewro milyonê karkerê tirkan, semedo ki lej biqediyê û heqê kurdan bêro dayiş grev kerd." Zaf hêvî nêkeno, la xeyalkerdîş tena zî, gelekî weş bê yê şono.

Axrikî spikero riverin û porqaymedaye bi zimbelanê xwi yê girsan reyra ekran di aseno. Xebera verîni: "Dewêk di, terorîstan 19 dewijî kiştî. Filan ca di bomba teqay; yew merd, çarî birindarî bî. Terorîstan otobusi ro guley varnayî..." Cadê xwi di zik û ziwa beno, seki çî ray xeberê anasarênî nêgoş tarîfî. Xeyalê yê, seki şuşaya ki erd ro bigina wîrdi wîrdi benî. Raştaya calî û gonîni yena çimandê yê ver: Dewî veşenî. Şaristanî xirabe benî. Welatperwerî kişiyênî. Binê işkencî di xortê kurdan gan danî. Bombay varenî koyan ro. Gedey mirenî.

Gedey kişiyênî. Kovarî, rojnamey herçî çiyê ki boya kurdan tira yena, bindê payan di yî. Deyax nêkeno. Zoran ver lewanê xwi kojenî; bêhemdê yê, destê yê şonî lewdê yê yê corênî ser, herunda zimbelanê taş tan. Destî, hukimê yê ra vejîyênî. Yew deme pordê yê yê firqî miyan ra geyrenî.

Ma mêrdimey ra hêviya xwi bibirni? Mêrdimey ra hêvî biriyêna? Çirê zilm endi serdestey keno? Mêrdimeya ki şêna hukim bika vay û varanî, ard û asmênî û heme qul û ganî çirê bena yesîrê zilmî? Çirê semedo ki hukim bika, bena mehtacê zilmî? Bêzilm, hukim nêbeno gelo? Heq, hiquq û hukim çirê pê nêkenî? Çirê herunda zilmî di, hewley û rindey nêbenî wayirê tac û textî? Hukim çirê edeletî ra terseno? Kamî hetanî nika xirabe-ya edeletî diya? Persê pê

pey ginenî. La gonî, termî hesrî, dej, t'ada, merrez, derd û kulî zorê persan û fikiriyayîşê benî. Serê yê maseno. Qesbay yê veşena. B'ecê yê heme çî ra yenî. Nêzanî se biko. Qesbay yê veşena. B'ecê heme çî re yenî. Nezanî se biko. Wardenî şono çarçiba hetî. Teber zî 'eynî hezey zerî tarî yo. Xwi ra cor asmênî ra ewniyêno. Asmên di estarey çinî. Aş mi çîna. Kihoyeya ki zerra yê weş bika çîna. Hinî Hûmay zî nêgeyre- no. Çimkî caran çimê yê ta nêkewto.

Seki kutikê harî gala bikî bide û ca çinêbo tira şêro, dîna endi dey rê teng bena. Destan xwi ra verra nêdano, la weziyetê yê xirab o, qewetê yê ser nereseno. Yew xewf dekwenî pîzzedê yê. Zerra yê tengî bena. Nêzano, wazeno bibermî yan zî biqêro. Bêqerar o. Pîzzey yê na yesîreyda yê veşeno. Xwi ver keweno. Mezgê yê zimeno. Riy yê sey adirî veşeno. Çimê yê vilikî kenî. Ere- qiyêno. Leşda xwi ser o herikiyayîşê ereqî hîs kenî. Fekê yê ziwa beno. Lewanê xwi yê ziwayan lêseno. Çendî ray aliya xwi dequltnenî. Pîzza ra yew hesirî anceno. Hilmê yê yew boya pîs dano. Reyey piro benî sey çuwan. Cîf yê ver û nêvejiyêno. Vano qey ez nika teterxan beno.

Ay hing di keynaya yê ya hîrê serra, vazdena yena, xwi erzana yê. Seki yew hewnê pîs ra newe xwi biaqilo û vajo "ez kura yo" norûdora xwi ra ewniyêno. Hêşê yê binney yeno pêser. Yay gênî verikda xwi û xwi ro şidêneno. Porê yay ê keji boy keno. Yew boya weşî tira yena. Boya bêsuc û bêguneyey, boya rindey û mêrdimey ki bide geyreno... Fesali reydi biskanê yay ridê yay ser ra heweneno. Çimanê yay ê lîlan ra ewniyêno. Çimî, çimî niyî, deryayê hêvî yî. Derya pêlin o. Hêvî, pêl bi pêl ver bi yê yena. Teqlê yê tikê sivik beno. Nika norûdora xwi di tena çimanê gedanê Kurdistanî veyne- no. Çimê zengî, çimê lîlî, çimê şalênî, çimê siyay. Kurdistan beno okyanusê hevî. Nêzano key? La zano, rew yan zî erey, zilm nê okyanusî di fete- siyêno.

J. ESPAR



KONFERANSA ZIMANÊ KURDÎ YA NAVNETEWEYÎ

**YEKKIRINA ZIMANÊ KURDÎ LAZIM E**

**Hejmareke bilind zimanzan û saziyên bi zimên re têkildar beşdar bûbûn. Roja yekemîn, 6.1.1995'an konferansa zimanê kurdî bi kêliyeke bêdengî di rêzdariya şehîdên Kurdistan û mirovahiyê de dest bi kar û barên xwe kir. Axaftina vekirinê ya ku ji hêla Serokê Enstîtuya Kurdî Prof. Î. Şerîf Wanlî ve hat pêşkêşkirin, bi giranbuhayî cihê xwe li cem beşdaran girt.**

Di mêtûya 6-8.1.1995'an de, bi bernameyeke sêrojî Konferansa Zimanê Kurdî ya Navneteweyî, bi beşdariyeke bilind karê xwe gihand serkeftinê. Konferans, ji aliyê Enstîtuya Kurdî Ji Bo Lêkolîn û Zanistiyê-Berlîn, Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK), Enstîtuya Kurdî-Stenbol, Akademiya Çand û Hunera Kurdî û Navenda Çanda Mezopotamya-yê (NÇM)- Stenbol ve hatibû birêxistin. Li bajarê Berlînê-Almanya, di Haus der Kulturen der Welt (Mala Çandên Dinyayê) de, rûniştinên konferansê dest pê kir.

Hin berî lidarxistina konferansê bala gelek cihên ragihandinê kişand ser xwe. Du radyoyên Berlîn û Radyoya Dengê Amerîka beşa Kurdî raste rast bi Enstîtuya Kurdî re ketin têkiliyê û li ser konferansê hevpeyvîn weşandin. Rojname û kovarên kurdî û biyanî bi konferansê re têkildar bûn.

Hejmareke bilind zimanzan û saziyên bi zimên re têkildar beşdar bûbûn. Roja yekemîn, 6.1.1995'an konferansa zimanê kurdî bi kêliyeke bêdengiyê di rêzdariya şehîdên Kurdistan û mirovahiyê de dest bi kar

û barên xwe kir. Axaftina vekirinê ya ku ji hêla Serokê Enstîtuya Kurdî Prof. Î.Ş. Wanlî ve hat pêşkêşkirin, bi giranbuhayî cihê xwe li cem beşdaran girt. Piştî hev-naskirina semînerdar, beşdar û mêvanan komîsyonên xebatê hatin hilbijartinê. Çar komîsyonên ku hatin hilbijartinê ev bûn: Komîsyona alfabe-yê, ya rastnivîsê, ya zaravayan û ya name û mesajan. Roja duyemîn 7.1.1995'an, bi awayekî zanistî û akademî semînerdar û beşdaran pirsgirêkên zimanê kurdî di ber çavan re derbas kirin û dîtînen xwe anîn ziman. Mamoste E.R. Akrewî bi firehî li ser cînavên kurdî rawestiya. Di şûn de, li ser alfabe-yê Prof. Dr. Î. Şerîf Wanlî, Dr. Zerdeşt Hajo, Dr. Celadet Çelîker û mamoste A. Balî rawestiyayan û dîtînen xwe pêşkêş kirin. Li ser rastnivîsê jî, Feqî Huseyn, Îzedîn Naso, Selîm Biçûk û Hisên Kartal dîtînen û pêşniyazên xwe anîn ziman.

Roja, 8.1.1995'an, li ser zaravayên kurdî Prof. Dr. Zerê Yusupova, Dr. Kurdistan Mukiryanî, Fergîn Melîk û Lerzan Jandîl bi firehî bir û baweriyên xwe pêşkêş kirin.

Gelek mesaj ji konferansê re hatin, ji van ên

balkêş mesaja ERNK-Ewrûpa, Rojnameya Welatê Me bûn.

Biryarên Konferansê:

1. Ji bo yekkirina zimanê kurdî pêwîst e, alfabe ya latînî ya C. Bedirxan ji bo hemû zaravayên kurdî bê bikaranîn. Her wiha lêkolînen zanistî li ser vê alfabe-yê dewam bikin.

2. Xweparastin ji devokên herêmî.

3. Bikaranîna peyvên kurdî ji hemû zaravayan li şûna peyvên biyan.

4. Pêşxistina peyvên hev-wate di nav zaravayên kurdî de.

5. Pêwîst e rastnivîs li ser bingeha fonologiyê (dengzanî) çêbibe.

6. Çareserkirina termologiya zimên û hemû beşên zanistiyê.

7. Birlêkirin ji bo çêkirina ferhengeke bi kurdî-kurdî bi hemû zaravayan û zelalkirina erdnîgariya Kurdistanê.

8. Heta niha bi du zaravayan edebiyata kurdî pêş ve çûye, pêwîst e bi zaravayên din jî bi pêş ve here û nêzikayî di nav zaravayan de çêbibe. Sala 1995'an, sala gelê kurd, sala zimanê kurdî, sala Ehmedê Xanî bi konferansa zimên hat vekirinê, ev jî dide nîşan ku bi rastî ev sal wê bibe sala gelê kurd, di her hêlê de.

SELÎM BIÇÛK

**REWEZ**

(BE SORANÎ)

**Rewez bo tewêlî şeytanekani birakuji...**

Berêzeka! Diyar e le songey riq û qîn da mirov bêpêşekî dête go, henawî xoy dax dekat û pê be cergî xoy da denê û herçî şitî tal û neşyaw heye dey siyênê û le rewzî helwêst da topelyan dekat û deydat be tewêlî şeytanekani birakuji da, belam wişekan bew aqare da ténaperin detirsin weku ew hemu gule nasikane helyanwerênin.. Wişekan detirsin, le şetekanî em rojareman detirsin, ew şetaney hemû dinya pêyan pê dekenin û ew galte cariyê be ser xoyan nahênin. Le şere qoçkey beharî rabirdu da, le tarawgey deştî êwe da bum, firyaneke-wtim çem kevrî wişe bigrime qoçekantan... Dwatir şukranem bo ew firyaneke-wtine bijard û witim xwa yar bê carêkî tir îş ew şere qirêje dubare nabêt ewe û min îş le ser taltirîn saxî gelekem sate şerî birakuji ye, lê esta le derwazey bilindî em eşkewtî xurbet ewe derwanim her gamêşe û peroy surî bo heldebrin, komelê şetî weku xoştan çepletan bo dekutin û pêtan pê dekenin.

Berêzeka! Be derdî xotan gel îş zefîl û rezîl meken, gel deştî le êwe şoriwe û xoştan baş dirik bew rastiye deken, tenê tikayekî me heye; dîrokî em gele etik meken, dîrokî ême be xwên nusrawetewe. Dezanîn întelatan kirduwe û bo hersî ew alîke fireye hewcedarî teratên û rimbazîn. Teratên û rimbazî xotan biken kes nabê be asteng, welê agatan le kêlgey û xermanî temenî hezar sale bêt, derxwardî agirî hez û hewese herzeyekantanî meden. Hemwan; be daman û raman ewe lem sêlavî negbetiye derwanin, em birîne be azar û cexare mayey nasorêke rondik le

çawî çiyakanman heldewerênê. Lez ken û asarî yektir bibrin ewe, ba asartan be ser pasartan ewe nemênê.. Biryay, sed biryay şewe bitanî-birdayewe û em tule rêy negbetî û pir keser û hesretetan be gelî kurd tey nekirdaye. Biryay, sed biryay le bar dayik-tan çunaye û wisa cergî dayikî xeliktan be pişkoy birakuji dax nekirdaye. Îdî watan kird le tek yad û boney mergesatekanman, Helebcekanman, Enfalekanman da boney em neberdaney êweş salane yad-keynewe û derzî gewrey lêwe fêr bîn, gileyîş le dujminanman nekeyin ke dost, bira û kesmanyan zînde be cal kird, bo na; çend dîlî yektir, çend roley Kurdistan tan be zîndwêlî kuşit û biynuy rewaştan bo kuştinyan le hegbe na. Pêwîst e gewre û biçukî em gele be şetî êwe bihesin, be çepile û kevir baran Kurdistan be der tan ken.. Sî sal aşî Baasiyan le ger da bu neytwanî biman maşê, çî ewen bûn bew xoreyey le tifengî kurd-dayetî kewtin û lêy nebûn ewe. Dilman kurkandî û teqî kird, le songey çî da waman pê deken, em ketne le pay çî.. Bew rewê berazane bilên nêrgizecarî evinman pêşelneken. Pêyan bilên; şiney xêr û xoşî kerwêşke be dexlî mebestman deken, be hengawî gure ewe berew pîriman dên, gavekan meşkênin, şikistî em care, gîrsanewey mehal e. Bo şerî birakuji çepke wişey gul asa bo hiç kesê deskene nakrê û be kes nawitrê desxoş, belku... Pêwîst e hemûman rewêze wişey riq û qîn bigrîne tewêlî şeytanekani em şer e.

SÎRWAN NANEREG



Serokê Enstîtuya Kurdî ya Berlînê Îsmet Şerîf Wanlî, ji milê çepê ve yê yekemîn.



# KÊ KIR MIN KIR!

Zarokino, werin em lîstikeke kevin bilîzin. Navê lîstika me "Kê kir, min kir" e. Divê lîstikvan ji sê kesan kêm tir nebin. Ji sê kesan zêdetir mirov hebin jî dibe û wê çaxê zewqa lîstikê pirtir dibe.

Lîstikvan li teniştê hev rûdinin, piyên xwe didine ber piyên hev. Ev rûniştin bi awayekî çemberî, helqeyî ye. Lîstika me bi stran e. Navê stranê jî "Kê kir, min kir" e. Her carê kesekî/ê jî lîstikê, stranê distrê heta ku lîstik diqede. Gava stran tê gotin, tiliya îşaretê li ser piyan digere, lê bi peyvekê re tê danîn û hilanîn. Stran li ser kîjan piyî biqede, ew pî jî lîstikê tê vekîşandin.

Heta ku piyek bimîne, lîstik wisa dewam dike. Kesê/a ku li dawiyê dimîne, çarmerkî rûdinê, bi destê xwe pêçika lingên xwe ya mezin digire. Du kes bi binê çengê wê digirin û dibin heta cihekî

kifşkirî û tînin cihê berê. Dirêjî û kurtiya mesafeya hilgirtinê, lîstikvan li gorî dilê xwe belî dikin.

Çaxa lîstikvan ji destê hilgêran bifilite, ji nû ve hilgirtinê tekrarkirin.

Piştî hînkirina lîstikê îcar em dest bi lîstika xwe bikin û em strana xwe pê re bistrin:

Kê kir, min kir  
Cehnem lê kir  
Ava rengê  
Li bin qulingê  
Hestiyê kewê  
Li bin mêwê  
Mêw qetiya  
Ji hacika  
Ji maçika  
Ev hêlîn e  
Ev paçik e.

Divê em dîsan bibêjin ku dema "kê kir" hate gotin, tiliya îşaretê li ser piyekî tê danîn, "min kir" jî hate gotin li ser yekî din tê danîn. Ji bo her rêza stranê ev awa divê bê pêkanîn.

SILÊMANÊ KAL



## N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

### Nûçeyeke derengmayî

Ez dixwazim bûyereke ku li navçeya A-medê, li Bismilê di 26.8.1994'an de qewimiye, vebêjim.

Li ber avahiya hikûmetê ya Bismilê Seîd Çardox û kesekî bi navê Ercan rastî hev tîn û kêfxweşiyê di hev didin. Di wê navê de ekiba polîsan li wan deng dike. Ji wan "xwe spartinê" dixwaze. Seîd destvala ye û tê girtin. Bi Ercan re demançe heye. Di nava wî û komser de lihevixistin derdikeve.

Di serî de komser ji sînga xwe birîndar dibe. Ercan xwe diavêje maleke nêzik û saet û nîvekê li ber xwe dide. Gelek leşker û tîmên taybet li ser serê wî dicivin. Tê gotin ku 35 berekên demançeya Ercan hebûne û ji leşker û polîsan yekî dikuje, yekî jî birîndar dike. Di dawiyê de jî Ercan berekekê berî serê xwe dide û xwe dikuje.

Tîm û leşker ew mala ku Ercan ji xwe re kiribû sîper, ji binî ve xera dikin, agir berdidinê.

Em werin ser Seîd Çardox, ew kesekî welatparêz bû û ji aliyê gel ve pir dihate hezkirin. Çar-pênc caran jî hatibû girtin. Ji ber ku Seîd Çardox nikarin bidine xebardan, ew diavêjin dû panzerê û bi erdê ve kaş dikin.

Ji gewdeyên wî dixuya

ku pê gelek îşkence kiribûn. Şopên derban lê hebûn. Tilî û pêçiyên wî pelaxtî bûn. Mêjiyê wî belav bûbû. Berekekî berî serê wî dabûn.

Dozgerê (sawciyê) Bismilê, rapora otopsiyê daye malbata Seîd Çardox ku, ew ji ber nerehetiya xwe miriye.

Ji vê qewmînê, ne Partiya Demokrasiyê -ji ber ku ew dem hatibû girtin- ne komeleya mafên mirovan, ne Rêxistina Efüyê ya Navneteweyî û ne jî rojnameyên demokratîk agahdar bûn. Cenaze jî bi awayekî qelebalix nehatin definkirin. Jixwe Ercan neşûştî ji aliyê tîm û polîsan ve tê veşartin.

Ez hêvîdar im, bi saya Welatê Me wê ev bûyera di tariyê de nemîne.

Bahoz Bager

### Welatê Me taciya serî gelî kurd e

Gelî kurd pêwîst e ke xoy bikete xaweniy rojnamey Welatê Me, bo ewey le dahatu da bitwanrê bikrête rojnameyêkey rojane. Her bayiş ebê Welatê Me da, xwaniyekaniy xwêneraniy be cê bigeyenêtenha le yek qalib da xoy berceste nekat.

Welatê Me nabête neha beşêk bêt le dengî ramiyariy gelî kurd, belku pêwîst e heman kat dengî kultur û litraturî kurdiş bêk.

Bo nimûne; beşiy zarokan pêwîst e be şewe-

yekiy wa biniwsrête ku zimanî halî mindalaniy kurd bêt û eger emkan hebit, rûpelî beşiy zarokan ziyatir bikrête û rengîn bêt, bew şewe ye etwanrête serinciy mindalan vabkêşrête bo lay zimanî kurdiş.

Welatê Me taciya serî gelî kurd e û wişey pîrozî kurdiş nûqrey ew tace pîrozemana.

Kurde Amîn / Swêd

### Em bixwînin û bidin xwendin

Gelî xebatkar û kedkarên Welatê Me, çawa ku kulîlka berfînê, serma û berfê diqelêşe û dertê,

Rojnameya Welatê Me jî pişaftin, tarîti, zilm, hovîti û zora li ser zimanê kurdiş qelaşt û dest bi weşanê kir. Bi vê dilê me kurdan geş û dilê neyaran jî reş bû.

Di heftiyê de carekê be jî zimanê me ji zengare xelas dike. Ev pêşkêtinek e... Lê ne bes e. Rojnameyêke xwerû bi kurdiş û xwedî lê derneketina xwendevanan nayê pejirandin. Sedem çî dibin bila bibin jî. Gelo heya kengê emê xwe bixapînin?!

Ji bo ku pênc qurûş zêde were ser mehmiza (meaşê) me, em xwe hîni zimanê îngilîzî, almanî û hwd. dikin. Zimanê biyanî hîn dibin. Lê hînbûna zimanê bav û kalên me ku bingeha hebûna me ye, ji me re zor tê. Bi rastî ev şermeke mezin e.

Bimînin di xweşiyê de. M. Ali Mutlu / Meletê



Sala Ehmedê Xanî li cepheya kurdan xwerû bi kurdî dest pê kir. Hîn di du heftiyên destpêka 95'an de kurd ketin nav hewldanê ku wê salê li gorî navê wê bixemilînin.

Di navbera 6 û 8'ê vê mehê de konferansa zimanê kurdî ji aliyê YRWK'ê, Enstîtuya Kurdî ya Berlînê, Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê û NÇM'ê ve li Berlînê hate li darxistin û pêvajoya sê rojan di rûniştinên konferansê de axaftin, guftûgo û semînerên bi kurdî li ser pirsgrêkên zimên hatin pêkanîn. Dawî ji bo yekkirin û pêşvebirina zimanê kurdî biryarên girîng hatin standin.

Li pey konferansê, ji aliyê siyasî ve jî kurdan gaveke dîrokî avêtin. Ev jî civîna li ser biryardayina sazkirina Parlementoya Kurdistanê ya li Derve bû. Ev civîna ku li pêşberî çapemeniya dinyayê li paytexta Belçikayê, li Brukselê li dar ket, tê de biryarên sazkirina parlamentoyê dîsa bi kurdî hatin xwendin. Wekî din di nava biryara sazkirina parlamentoyê de di hate diyarkirin ku wê zimanê parlamentoyê bi kurdî be.



## Ji Welatê Me

MAZHAR GÜNBAT

### Ji bo kurdî saleke bibereket

Bêguman ji bo rakirina qedexeyên li ser kurdî û pêşvebirina wî ev jî madeyeke dîrokî bû. Ka bifikirin, ev parlamento li derve be jî, her roj wê civîn, daxuyanî û xebatên xwe bi kurdî pêk bîne. Hingê hemû kurdên ku zimanê xwe bi tenê li gund bi kar tînin, wê fêhm bikin ku di saziyên herî bilind ên mîna parlamentoyan de jî bi hêsaniyê dikarin zimanê xwe bi kar bînin.

Di destpêka sala nû de, dîsa ji aliyê YRWK'ê ve li navenda Almanyayê, li Bonn'ê Yekitiya Mamosteyên Welatparêz ên Kurdistanê ava bû. civîna wan jî bi kurdî bû. Helbet ev hedîse hemû êdî zehfji aliyê siyasî ve xwedî wate û rolên girîng bûn û hêjayî nixandînan dorfireh in. Jixwe em di rûpelên xwe yê

din de li ser naveroka wan bi dorfirehî sekinîn û emê hîn jî li ser binivîsin. Bes, li vê derê tenê min xwest ez balê bikişînim ser gavên girîng ên ku di warê kurdî de hatin avêtin.

Di warên siyasî û gelek warên din de jixwe ev 15 sal in her tim pêşveçûn çêdibin.

Parlamentoya li Derve û sazkirina rêxistinên din jî bêguman berhema têkoşîna çêkdar in.

Mixabin di ware pêşvebirina zimên de heta niha zêde tişt nehatibûn kirin û hinek jî ev war hatibû îhmalkirin. Destpêka sala Ehmedê Xanî bi van her sê bûyerên girîng, li teniştê pêşveçûnên siyasî, hêviya gavavêtinên girîng ji bo zimên jî dide me.

### Belavkirina Welatê Me

Em li Tirkiye û li bakurê Kurdistanê Welatê Me bi navgîna şirketa belavkirinê digihînin xwendevanan. Bes li gelek deveran polîs bêyî qerarê berhevkirinê rojnameya me bi darê zorê ji hin bayyan distînin û komdikin. Em rojnameyê ji xwendevanên xwe yê Ewrûpayê re jî bi postê dişînin. Lê gelek xwendevanên me yê derve dibêjin ku Welatê Me nagihîje destê wan. Wisa xuyaye polîs êdî li postexaneyan jî dest datînin ser weşanên me. Bi rastî, bi taybetî di van demên dawî de li Tirkiyeyê tu ferq di navbera zehfê midûrên postexaneyan û polîsan de nemaye. Ew midûr li postexanê ji polîsan zêdetir li ser rojnameya me disekin, pirsên ecêb dikin û carna jî li gor mejiyê xwe dibêjin ku rojnameya me belavkirina wê qedexe ye û hwd. Dema tewra midûrên postexanan ev be, divê nevé dema rojnameyên me negihînin xwendevanan em jî midûran dikevin şuphê. Çi hejmarên nagihin destê xwendevanan, ku em jê bînin haydarkirin em careke din dikarin ji war bişînin.

## N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

### Hesenê Jir û midûr

Zemanê berê, leşker û karmendan wan li gundiyan pir zilm dikirin, ji gundiyan tişt distandin. Pezê kê hebûya gere yek jê bidana midûr. Carek midûr çavê xwe berdide nêriyê Hesenê reben. Ji ber ku ew pir bedew e.

Hesenê reben wê çawa bike. Dibêje baş e. Dibe êvar, pezê gund tev ji dehlê tê. Nêriyê Hesen nayê. Diçe ba midûr. Dibêje, "Begê min wele nêrî wînda bûye." Midûr aciz dibe, cendirmeyan dişîne, jina Hesen tîne, qereqolê, ji ber nêrî ve digire. Dibêje, "Hesen te nêrî firot, tu min dixapînî. An nêrî bîne an jina te çû."

Hesen radibe, tivinga xwe hiltîne diçe dehlê. Dinîhere ku gur nêrî dix-

we. Bi tivingê berî gur di-de. Lê namire. Diçe postê nêrî jêdike û li gur dike. Tîne dixê nava pezê midûr. Jina xwe ji midûr digire û gund terk dike. Diçe gundekî din. Jina xwe datîne mala yekî gundî. Destekî cilê jinan li xwe dike. Diçe mala midûr û giliyên Hesen dike. Dibêje, "Midûr beg, mêrê min esker e. Ev Hesenê vî gundî ez rezil kirim. Ez cihê wî dizanim." Midûr, "Tu gelek bixêr hatî. Wî Hesenî çî bi min kir, malika min xerab kir. Hezar pezê min da gur. Îşev laha (li vir) razê. Sibehê emê bi hev re herin wî bikujin."

Hesen dibe mêvanê midûr, ew û jina wî ve li odeyekê radikevin. Nivê şevê dest diavêje jina midûr. Serê sibehê zû radi-be midûr jî dikuje. Planên jina midûr û Hesen ev e: eskerê Rûs hatine ew kuştine. Hesen hem jina midûr li xwe mehr dike û hem jî digihîje mala xwe. Gundî jî, ji zilma wî xelas dibin.

Ramazan Çakar

### Wê gulên kesk û sor û zer derkevin

Bi derketina Rojnameya Welatê Me em gelek dilxweş bûn û bêhna me fireh bû. Em dizanin ku xebata we çiqas girîng e. Li hawirdorê we gurên birçî digerin, wekî kûçikan har bûne. Harbûna wan ji ber nêzîkbûna dawîya wan e. Rojnameya Welatê Me û Rojnameya Özgür Ülke, bûne dîwarên qalind li ser sînga wan. Bûne girêk di gewriya wan de. Ew tim li benda xwîne ne. Wan gelek xwîna gelê me û gelê din vexwarine. Ewê dawiyê di wê xwîne de bifetisîn.

Gelê me rabûye ser piyan êdî tu caran nakeve. Hêviya me tev bi bazên serê zinaran heye. Bûne babisokên ji êgir. Cihê lê dimeşin dihejînin. Ji bo

wê yekê em zanin serxwebûn nêzîk-bûye.

Roj wê bê, li dewsa xwîne gulên kesk û sor û zer derkevin. Wê bajar û gund bi ala rengî bê xemilandin, wê zarok, jin, bav û law ji dil bikenin û şad bibin. Ew roj pir nêzîk e. Hatina wê rojê tu kes nikare bisekinîne.

Em bi we re ne Hûn her hebin Welatê Me rûmeta me ye.

Metin Demir / Mêrdîn

### Kêmasiyên di warê zimên de

Gava mirov dîrokê dixwîne, dibîne ku heya niha gelek ziman hatine kuştin û bûne zimanên mirî. Pevçûna zimanan ker û bêdeng e, bêtop û bombeavêj e. Di şerê ziman-kuştinê de, rehên jiyana zimên tînin qetandin û pêta heyîna wî tê vekuş-

tin. Ziman, li hev dixin, kuştina peyvên hev dikin. Êrişa peyvên bêdeng e, hin bi hin dikevin kûrahiya zimanên din. Çardorên wî digirin. Wî jî hîm û bingehên wî hildeweşînin. Li ser vê hilweşînê, neteweyek ji vê çîhanê kêmbûye.

Her çend zimanê kurdî negihîya wî warî jî, ku kurd li zimanê xwe miqate nebin wê aqûbeta wan zimanan bê serê me jî.

Pirsgrêka zimanê kurdî ji pir deveran tê.

1. Gelek peyvên kurdî ketine nava zimanê biyaniyan û kurdan ew tenê di ferhengan de hiştine

2. Gelek peyvên biyan ketine nava zimanê kurdî, lê peyvên ku şûna bigirin di zaravayên kurdî de hene

3. Gelek kurdan zimanê xwe ji bir kirine, nikarin pê bixwînin û pê binivîsin

4. Pirbûna tîpên nivîsandîna wekî latîni, kirîli, erebî

5. Xebateke kêmbûna di warê berhevkirina zaravayên kurdî de û nebûna termînolojiyê.

Rûken Ensarî/Izmir

## WELATÊ ME

Rojnameya Heftiyê  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
ROZA Basın ve Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)  
Aynur BOZKURT

Gerîndeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
Mazhar GÜNBAT

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran  
(Yazışleri Müdürü)  
Mehmet GEMSİZ

Berpirsiyarê Nûçeyan  
(Haber Sorumlusu)  
Suut KILIÇ

Redaktor  
Sami TAN

Berpirsiyarê Têkiliyên Gelêrî  
(Halkla İlişkiler Müdürü)  
Sıraç AKSOY

NAVNÎŞAN (Adres)  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX  
249 13 44 - 245 29 91

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ  
(Temsilcilikler)

Hewlêr- Niwa Hebib  
Suriye- Jan Dost  
Fener Rojbiyanî

Berlin- Soliman Sidou  
49-30-69 00 26 95

Badenwurttemberg-  
A. Rahim Ayaz  
49-75453258

Hamburg- A.Hekim Gülsün  
49-40-40 33 88

Bonn- Ahmet Baraçkılıç  
49-228-66 62 49

Amsterdam- Cotyar Zaxoy  
31-20-613 07 66

Swed- Amed Tigris  
46-8-740 69 81

Hannover- Selim Biçük  
49-5721-813 60

Munchen- Mahmut Gergerli  
49-871-670 884

Paris- M.S. Ayçiçek  
33-1-48000401


Atina- Sirwan Reşid  
Bekir Bahoz  
30-1-3634905





SEROKÊ KUBAYÊ Û ŞOREŞGERÊ KEVNARE FÎDEL KASTRO DI AXAFTINA XWE DE DIGOT:

# EM TU CARAN NABIN SERMAYEDAR!



Serokê Kubayê Fidel Kastro

Nûnerên di civînê de bi hevdu re çepik dikutan. Fîdel!.. Fîdel!.. Fîdel!.. Biaxife Fîdel!.. Biaxife!..

Fîdel got: "Em dixwazin ji guhdariya we bikin, bi peyvên xwe ramanên xwe eşkere bikin. Em naxwazin derî dîtînen we tu biryaran bistînin." Piştî ku herkes axivî û komîsyonan raporên xwe xwendin û belav kirin, roja paşîn çav ziviribûn ser Fîdel. Fîdel ji cihê xwe hêdî hêdî rabû, kemera piştî xwe rast kir, riha sipî bi destan xurand û her bi mîkrofonê meşiya... Dê weledê xwe diavêt. Salona şanoya Karl Marks, rojeke wisa nedîtîbû. Dengê çepikan ji salonê diçû der. Li nava taxên Havanayê belav dibû. Fîdel bi dengê

hûr û nerm dest bi axaftinê kir: "Amerîka qala mafên mirovan dike. Me ew li Guatemala, li Arjantîn, li Şîlî, li Nîkaragûa û li Xelîca Basrayê dît. Amerîka bi me re, ne bes şerê aborî dike. Ev sîh û pênc sal in ku ew li dû sabotaj û komployan venegeriyane. Her tim li dû kuştina serok û rêvebirên şoreşê ne.

Ka Kuba çi dike? Kubayê heta îro ji bo mirovatîyê çi ji dest hatiye kiriye. Hûn di dîroka şoreşê de yek bûyera îşkenceyê nabînin. Hûn yek kesê ku ji ber dîtîni û kirînen polîtîk hatiye dardekirin nabînin. Tu kesî ku di binçav de hatiye kuştin an jî hatiye windakirin nabînin.

Şoreşa me gelek hêjarî derxistine meydanê.

Di zanistiyê de, di sporê de, di hunermendiyê de gelê Kubayê bi riya şoreşê zehf bi pêş ketiye.

Îro aboriya me di tengasiyê de ye. Li Kubayê di tîkiliyên aborî de guhertînen nû hene. Bes divê bê zanîni ku, em çi dikin û emê çi bikin, emê bi gel re bikin. "Her tişt ji bo gel û her tişt bi gel re." Em ji rêbeza sosyalîzmê venagerin. Hûn bizanîbin ku em tu caran nabin kapîtalîst. Em riya hevkarîyê û internasyonalîzmê bernadin."

Wezîrê Karên Derve Roberto Robon yê 34 salî, ji Yekîtiya Ciwanên Komunîst hatiye Komîteya Navendî û bûye wezîrê derve. Roberto bûye sembola "nû"bûnê. Kubayî hezkirina xwe didin xuyan

û jê re dibêjin "Robertiko". Her çiqas tê gotin ku Fîdel bimire wê birayê wî Raul Castro bê şûna wî, ev heqê wî ye jî, xuya ye Kubayî hêdî hêdî ji paşnavê "Castro" aciz dibin. Dibêjin "Mala wan ava be, belê êdî bes e." Stêrka Robertiko diçûrise. Jixwe Roberto jî bi kurkirina porê xwe, bi reng û moda kincên xwe bûye nîşana rûyê Kubaya yê nû.

Wekî her dewletan komunîst li Kubayê jî diravên (pere) biyanî bes di destên dewletê de hebûn. Ku bi riyekê pir an hindik çend dirav ketibûna destê gel jî, wan nikaribûn bi van diravan tişt bikire. Kubayê tişteki qenc kiriye. Qedexeya diravên biyanî rakirine.

Bi van dolaran û bi giranîdayîna tûrîzmê (di sala 1994'an de 700 hezar tûrîst çûye Kubayê) Kuba ji birçibûna giran xelas bûye. Dîsa jî xwarin û gelek hewceyên girîng bi dest herkesî nakevin û bi qarneyê tînen belavkirin.

Nûbûnek din jî ev e: Kubayê deriyê xwe ji sermayeyê biyan re vekirîye. Karsaziyên biçûk bi sermayeyê biyan re, bi şîrîkatî dişuxilînin.

Bi navê "Bazarên Çandiniyê yê Serbest" saziyê nû li dar xistin ku li gorî vê ya cotkar û pale êdî dikarin ji xwe re, li ser kîsê xwe çandiniya fêkî, hêşinayê û hwd. bikin û bifiroşin.

Di vê nivîsê de heke em qala gotina "Jînetera" (Xwendina wê Hînetera) nekin wê nivîs kêmbibîne. Peyva jînetera, bi îspanyolî ya herî kevn e, di zimanê îroyîn de nayê xebitandin. Bes di zimanê argo ya Kubayê de cih girtiye. Di îspanyolî ya kevn de jî siwarê hespan re digotin: Jînetera.

Ji bo diravan, ji bo xelatekê an jî, ji bo ku bikaribin bikevin aşxane, otel û maxazayên tûrîstan, keç û jinên ku bi tûrîstan re hevaltiyê dikin re "jînetera" tê gotin. Ew ne profesyonel in. Ango em nikarin ji wan re bibêjin fahişe.

Pirtirên wan li der û dorra otelên tûrîstîk tîne dîtînen.

Sala çûyî sefirê Tirkiyeyê Havana ji me re gotibû: "Li dinyayê tu gel, mîna Kubayîyan bifêz (gururlu) tune ye." Îsal jî dîtînen wî nehatibûn guhertin. Wî ji sazûmana komunîst hez nedikir belê dîsa jî digot: "Ez dimînim ecêbmayî. Li gorî zanîna min rêvebirên partiyên komunîst, gel çiqas di tunebûnê de be jî, ew di kêf û zewqê de dijîn. Min dît ku li Kubayê ne wisa ne."

Rapora komîsyonên civînê wisa qediyabû: "Em ji 109 welatan, 3072 kes di civîna "Ji Bo Alîkariya Kuba Hevdîtina Dinyayê ya Yekemîn" de dibêjin ku, em heta dawiyê, serxwebûna Kubayê diparêzin. Mafên Kubayê heye ku riya xwe bi serê xwe hîlbişêre. Em bi Kubayê re ne. Em ji Meclîsa Neteweyên Yekbûyî û ji hikûmeta Amerîka re dibêjin vê ablûka bêdadî li ser Kubayê rakin. Em îlan dikin ku em hevalbendên Kubayê û gelê Kubayê ne."

Civînek bi vî awayî qediyabû.

Em jî bi kula Kubayê zivirîn rojhilata navîn.

Em hatin navêgir. Em hatin ku hê jî Kurdistan dişewite.

OSMAN ÖZÇELİK

**Fidel di civîna "Ji Bo Alîkariya Kuba Hevdîtina Dinyayê ya Yekemîn" de digot ku: "Amerîka qala mafên mirovan dike. Me ew li Guatemala, li Arjantîn, li Şîlî, li Nîkaragûa û li Xelîca Basrayê dît. Amerîka bi me re, ne bes şerê aborî dike. Ev sîh û pênc sal in ku ew li dû sabotaj û komployan venegeriyane. Her tim li dû kuştina serok û rêvebirên şoreşê ne.**

